

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

92

2025

bîrnebûn





Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 92/ 2025
Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Editor: Ali Çiftçi, Heciyê Gulê, Muzaffer Özgür

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 30 TL
Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Koma hevkarên vê hejmarê:
Ali Çiftçi, Adem Özgür, Hızır Akbina, Mem Xelîkan, Dr Mikailî,
Muzaffer Özgür, Xoyretinê Mihemmedî Seid, Melik Özkan,
Fehmî Karaçelik, Zeynep Karatay, Bedirxan Ergul, Elif Doğan,
Dilan Kaya, Siya Jandar, Bêrivan Keskîn, Seyfî Doğan,
Prof. Dr. Hacı Akman, Yusuf Kayna, Mehtab İdelî, Xizan Şilan,
Rojvan Enes, Bilal Celepli
Belavkirin / Distribution:
Ewropa: Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Medya Kitapevi
Bekar Sokak No: 7, Giriş kat.
Beyoğlu / İstanbul / Türkiye

Adress
Navnîşana li Swêdê
Apec
Mjölmarstigen 1
SE 163 41 Spånga/Sverige
E-post: info@apectryck.se
Internet: www.birnebun.eu

Her nivîskar bersive nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tî, sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegeandî. Ji ber stîl û devokên taybet em dest nadin hinek nivîsên nivîskarên xwe.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela Ziman li Almanayê piştgirî kovanê ne.

Wêneyê berga pêşîn: Gundê kurdan, Bekir Dan

bîrnebûn 92
ISSN 1402-7488
2025

Naverok

Ji bîrnebûnê	4	Alî Çiftçi
Li diyasporayê wendayî û destkeftiyên kurdan çi bûn?	6	Red.
Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî	8	Alî Çiftçi
Komeleya Ziman, Çand û Hunerê ya KONê ava bû	11	Adem Özgür
Rêwîtiya komeleyê	15	Melik Özkan
Çend gotin	16	Fehmî Karaçelik
Ez tenê kesek im	17	Zeynep Karatay
Serpêhatiya min	18	Bedirxan Ergul
Wexta ez biçûk bûm	19	Elif Doğan
Helbesta Melikê Donê	20	Rojvan Enes
Bîranîna qirkirinê: Helebçe	21	Prof. Dr. Hacı Akman
Kilamên me (XV)	32	Meme Xelîkan
Dayika strana, Êma Hemê -III	36	Hızır Akbîna
Rojnivîsk -III, Ma ode jî dimirin?	39	Bêrivan Keskin
Dibe ku demek bê	42	Dilan Kaya
Li Kulu û Cihanbeylîyê guherînên civakî û demografîk	44	Adem Özgür
Li vî warî	48	Mem Xelîkan
Dara paça	49	Mem Xelîkan
Xewna kamiliyê	50	Siya Jandar
Bîranîn: "Cûtken Heremî li ku ye?"	52	Bilala Celepli
Kerr û Kullike Silêvî	56	Dr. Mikailî
Ez aşê sebrê me	61	Xizan Şîlan
Helbest	62	Seyfî Doğan
Qerfo û Quto	63	Seyfî Doğan
Fedî	64	Mehtap Îdelî
Dîroka hunera tevnê, xali û kurd -II	70	Muzaffer Özgür
Dengê bêdewletîya min - II	76	Xoyretînê Mihemmedî Seîd
Eşîra Cihanbeylî û eşîrên têkilîya wê	77	Yusuf Kaynak

Ji Bîrnebûnê

Em di meha Newrozê de dîsan bi hev re ne. Ev meha adarê, bihara pêşîn, li welatê me herçiqas bi şahî, hêvîyên jîyaneka xweş bi girtina govendên girse li seranserê welêt û li diyassporaya kurd dest pê bike jî divê em tu carî "Anfal", Helebçe, Robotskî û komkujî, malwêranîyên ku li ser însanên me hatine kirin ji bîr nekin! Mixabin piranîya van malwêranîyan jî di vê mehê de çêbûne û bi bîranîna wan rojan em ê vê rastîyê derbasî nîfşên nû bikin da ew jî bibin berpîşîyarîya gihan-dina nîfşên pêşerojê.

Ji destpêka serê salê ve ye li seranserê cîhanê û li Rojhilata Navîn bûyerên pir bi lez û dîrokî çêdibin ku girêdaneka xwe ya mezin bi welatê me re jî heye û em hêvî dikin bo xelkê me erînî be! Ew êş û elemên ku heta niha xelkê me kîşandîye bi dawî bên û em jî wek xelkên din li ser axa welatê xwe bi nasnameya xwe serbilind bin!

Em bi hêvî ne, ji ber em dibînin ji nîfşên nû xwedîderketina nasnameyê, ji bo pêşxistin parastina ziman, çand hewildan li welêt hene:

bo nimûne vekirina komeleya bi navê *Komeleya Ziman, Çand û Hunerê ya Konê* li navçeya Kuluyê ya Konyayê. Hevkarê me Adem Özgür bi sernivîsa *Komeleya Ziman, Çand û Hunerê ya KONê ava bû*, vekirina KONê bi me dide nasandin. Dîsan cîyê dîlşahîyê ye, ev kesên ku di rêvebirîya komela KONê de cih girtine bi nivîsên xwe tevli vê hejmarê bûne. Melik Özkan bi sernivîsa *Rêwîtiya komeleyê*, Fehmî Karaçelîk bi *Çend gotin*, Zeynep Karatay bi sernivîsa *Ez tenê kesek im*, Bedirxan Ergul bi sernivîsa *Serpêhatîya min*, Elif Doğan bi helbesta *Wexta ez biçûk bûm* nivîsîne. Mala wan ava be! Em bi hewildan û xebatên wan serbilind in û ji vira ha ew ê bi nivîsên xwe kovarê dewlemend û berfirehtir bikin.

Birêz Prof. Dr. Hacı Akman li ser Helebçeyê bi sernivîsa *Bîranîna qirkirinê* nivîseka lêkolînî ya li ser *cemidandina êşê û li muzexaneyê nîşandana wê* lêkolîye. Birêz Akman di vê lêkolîna xwe de hem li ser muzexaneyê û abîdeyên Helebçeyê

bi wêneyan daye nasandin û hem jî bi muzexaneyên din, wek ya cihûyan a bi navê Holokastê dide berhev û wekhevîyên wan destnîşan dike.

Di vê hejmarê de ji çanda me ya gelêrî serpêhatî û kilam ji Mem Xelîkan, bi sernivîsa *Kilama Mehmî Neîm*, ji Hızır Akbîna *Dayika strana Êma Hemê-III*, kilama *Îbramî Mexmê* û serpêhatîya *Êm û Almas*, ji Bêrivan Keskinê *Ma ode jî dimirin*, rojnivîsek, ji Dîlan Kaya kurtenoveler bi navê *Dibe ku demek bê* hatine nivîsîn. Bilal Celepli bîranînek bi sernavê *Cûtikên Heremî li ku ye?* nivîsîye.

Adem Özgür, bi sernivîsa *Li Kulu û Cihanbeyliyê guherînên civakî û demografîk* bal kişandiye ser pîrseka girîng ku divê em wek kurdên ji Anatolîya Navîn li ser bisekinin.

Dr Mikailî, bi sernivîsa *Kerr Kul-like Selêvî* ji folklorê me çîroka ku ji gundê Mikaîla ji Taşoyî Yehmedî Macîr bihîstîye berhev kirîye û bi devoka xwe nivîsîye.

Xizan Şîlan dîsan bi helbesteka xwe ya *Ez aşê sebrê me*, Seyfî Doğan helbest û haiku bi sernivîsên *Qerfo* û *Quto*, Mem Xelîkan bi navê *Li*

vî warî û *Dara Paça* ev hejmara bi helbestên xwe reng danê.

Mehtap Îdelîyê li ser erf û edet, rabûn û rûşkandina kurdan yên berê bi sernivîsa *Fedî* di çend xalan de nîşan daye û herwiha gotina fedî çî ye, şîrove kirîye.

Muzaffer Özgür rêzenivîsa xwe ya bi navê *Dîroka hunera tevne, xali û kurd* beşa diduya bi wêneyan raxistiye ber çavên me.

Xoyretînê Mihemmedî Seîd bi navê *Dengê bêdewletîya min -II* raman û derdê dilê xwe bi me re parve kirîye.

Birêz lêkolîner û nivîskar Yusuf Kaynak teza lîsansa Mustafa Doğan a li ser *Eşîrên Cihanbeyliyan û Çêbûna Sosyal-Aborî ya Eşîran* li gorî *Deftera Nifûsê ya Osmanîyan ya hejmare 3525* bi sernivîsa *Eşîra Cihanbeyli û eşîrên têkilîya wê* daye nasandin.

Bi hêvîya Newroza 2025an bibe destpêka jiyaneka serkeftî û aram a sala nû, Newroza we gîştikan pîroz be!

Heta hejmara tê bimînin di xêr û xwaşîyê de!

Alî Çiftçî

Li diyasporayê wendayî û destkeftîyên kurdan çi bûn?

Diyaspora ji bo kurdan hem wek wendayî û hem jî wek destkeftî tê dîtin. Li jêr Prof. Dr. Hacı Akman hinek xal nivîsîne da ku em hejmara 93an wek tema *Diyaspora kurdan*, li her welatê ku kurd lê dimînin, însanên me dîtin û serpêhatîyên xwe yên li derveyî welêt, yên xerîbîyê binivîsînin.

Redeaksîyon

Wendahiyên ji bo kurdan:

1. Parçebûna civakê:

Diyasporaya kurdî bûye sedema belavbûna mirovan li seranserê cîhanê, ku civaka kurd perçe kiriye. Ev yek ihtîmala nasname û rêxistineke netewî ya yekbûyî lawaz dike, nemaze di têkoşîna xwerêveberiyê de.

2. Wendabûna ziman û çandê:

Gelek kurdên li dîasporayê, bi taybetî nîfşên duyem û sêyem, di bin metirsiya windakirina zimanê xwe (kurdî) û têkiliya bi çanda kevnêşopî re ne. Asîmîlasyonê çanda welatê mazûvan

dikare bibe sedema qelsbûna nasnameya kurdî.

3. Di cudakarî û marjînalîzekirinê de:

Li gelek welatan kurdên li dîasporayê bi marjînalbûn û cudakarîya aborî re rû bi rû dimînin, ev yek ji wan re zehmet dike ku hebûna xwe ya bi îstîqrar û serbixwe bidomînin.

4. Kêmbûna tesîra li ser welêt:

Ji ber ku gelek kurdên dîasporayê ji pêşhatên siyasî û civakî yên li welatên xwe (Tîrkiye, Iraq, Îran û Sûriyê) dûr in, ev jî dihêle ku bandora wan a rasterast di têkoşîna otonomiya kurdî de kêmbike.

Destkeftîyên ji bo kurdan:

1. Dengê cîhanî:

Diyasporaya kurdî di bilindkirina doza kurd bo asta navneteweyî de rolek girîng lîstîye. Çalakger, rewşenbîr û siyasetmedarên li dîasporayê têkoşîna kurdan a ji bo maf, çand û xweseriyê bilind kirin.

2. Piştgiriya siyasî û aborî:

Diyaspora piştgiriya aborî dide malbat û rêxistinên li herêmên wan, ku ji bo parastina çand û tevgerên siyasî pir girîng e. Weke mînak, dîaspora ji bo deverên kurdistanî yên li Herêma Kurdistanê çavkaniyek aborî ya girîng bûye.

3. Parastina çandê bi şeweyên nû:

Civakên kurd ên li dîasporayê komeleyên çandî, dibistan û çalakiyên ku ziman, muzîk, huner û kevneşopîyan bi pêş bixin ava kirine. Van tedbîran hişt ku çanda kurdî li derveyî welatê xwe bimîne.

4. Tor û bandora navneteweyî:

Diyasporayên kurdan ên li welatên wek Swêd, Almanya û DYÊyê têkilîyên xurt ava kirine ku bandorê li siyaset û

biryarderên welatên mêvandar dikin. Ev jî bûye sedem ku piştgirî ji bo maf û dîtina kurdan li ser asta cîhanî zêde bibe.

5. Gihîştina perwerdehî û teknolojiyê:

Gelek kurdên li dîasporayê bi awayekî rasterast an jî bi piştgirîya zanist û çandî bigihêjin xwendina bilind û çavkaniyên teknolojik ên ku vedigerînin gelê xwe.

Balansa di navbera winda û destkeftîyê de:

Digel ku diaspora dikare bibe sedema windakirina girêdan û nasnameya herêmî, di heman demê de dikare bibe motorek bihêz ji bo pêşdebirina doza kurdî li seranserê cîhanê. Ji bo zêdekirina qezenc û kêmkirina windayan, girîng e ku:

- Li dîasporayê lazim e hînbûna ziman û parastina çandê bêt pêşxistin.
- Pêwendîya diaspora û welêt bi rêya teknolojiyê û çûyîna welêt bêt xurt kirin.
- Bikaranîna bandora dîasporayê ji bo peydakirina piştgirîya cîhanî ji bo mafên kurdan û parastina çandî.

Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî

Alî Çiftçî

21ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanê ye. Ev roj ji aliyê UNESCOyê ve di sala 1999an de ji bo pêşxistina cihêrengiya zimanî hate damezrandin û cara yekem sala din, di sala 2000î de hat pêrozkirin.

Li Swêdê statîstîkên zimanên fermî tunen, lê tê texmînkirin ku nêzî 200 zimanên dayikê têne dengkirin. Ya herî mezin swêdî ye ku bi qasî 8 mîlyon kes pê dengdikin, li pey zimanê swêdî finî û erebî tên. Pir zimanên dayikê li Swêdê tenê çend sed kesên deng dikan he- ne, wek zimanên afrîkî wolof an mandinka. Fînlândî, samî, meänkieli, romanî û yiddîşî wek zimanên hindikahiyên netewî xwedî statuyeke taybet in, ji ber ku Swêd di sala 2000an de Pey- mana Ewropî ya ji bo Parastina Zimanên Kêmetewan îmze kir.

Ji bo her mirovekî xwedî der- feta pêşxistina zimanê dayikê pêwîstîyeke bingehîn e. Kesê ku

ji zimanê xwe yê dayikê bêpar bimîne jiyanek diwartir heye.

Zimanê dayikê tu cara nebûye asteng

Zimanê malê (zimanê dê) yê zarokan ti carî nebû asteng bo entegrasyonê. Gelo, dersa hîn- bûna zimanê dayikê bandorê li entegrebûne dike? Xebatên zêde yên ziman zirarê didin encamên xwendekaran û pêşketina zanîne? Hema beriya niha bi salekê hikû- meta nû ya muhafazekar ku bi alîkarîya partîya nijatperest (SD/Demokratên Swêdê) ku ev hukumet wek partîyên Tidoyê tên bi navkirin, ji bo ku bibîne lêpirsînerek peywirdar dan ki- rin. Hêviya Demokratên Swêdê/ *Sverige Demokrater* (SD) ew bû ku ev lêkolîna bibe sedema wen- dakirina mafê mijara ku berê bi zimanê malê dihat binavkirin, yanê perwerdeya zimanê dayikê ji holê bêt rakirin. Di nava salan de hin Demokratên Xiristiyan û

Partîya Moderatan jî pêşniyar kirin ku ev maf bê vekîşandin. Lê hêviya wan bi cîh nehat.

Xwendekarên ku beşdarî perwerdeya zimanê dayikê dibin, li dibistanê ji yên ku perwerdeya zimanê dayikê nagirên baştir performansê dikin. Gelo zanîn ji ber hînkirina bi xwe ye yan jî sedemên wê yên din hene ne diyar e. Lê lêpîrsîner nikare tu delîlan bibîne ku xwendina zimanê wan ê dayikê bandoreke neyînî li zarokan dike, ku divê bi rastî jî tu kesî şaş neke.

Kenneth Hyltenstam, profesorê Emerîtusê lêkolîna duzimanî li Zanîngeha Stockholmê, wiha dibê: *ji sala 2008an û vir ve, herî kêm sê lêkolîn nîşan didin ku xwendekarên ku çend sal in perwerdeya zimanê dayikê dîtine, encamên baştir ên xwendinê bi dest xistine. Lêkolîna herî mezin di sala 2019an de di çarçoveya lêpîrsîna hikûmetê de pêk hat û di pola nehan de 26 502 xwendekar têde bûn. Eşkere bû ku yên ku bi zimanê xwe yê dayikê hatine perwerdekirin, dereceya wan a xwendinê baştir e.*

Lêkolînê Marie-Hélène Ahnborg bi vî awayî pêşniyar dike ku li şûna ku qonax bi qonax ji holê rakirina perwerdeya zimanê dayikê divê perwerdehiya zimanê dayikê bê pêşxistin. Bi temamî li gorî bingeha zanistî ya ku heye.

Encamên lêkolîna ku dawîya sala 2024an hatiye kirin zelal in. Zarokên koçber ên ku rind perwerdeyîya bi zimanê xwe yê dayikê digirin, di dibistanê de baştir dixwînin û pirê caran jî di zimanê swêdî de çêtir dibin. Xwendekarên ku ji bilî zimanê xwe yê zikmakî bi zimanekî din dixwînin, wek nimûne xwendekarên dibistana amadeyî ku zimanê wan ê zikmakî swêdî ye û dersên xwe bi îngilîzî dixwînin, rîska hînbûna kêmtir ji wan heye.

Zimanê dayikê pîrsgirêkek siyasî ye

Pêşeroja zimanên dayikê li Swêdê pîrseke siyasî ye. Divê hemû cureyên zimanên kêmteweyan di civakê de zêdetir bên dîtin. Divê li dibistanan perwerdeyîya bi zimanên dayikê ji bilî swêdî bê berfirehkirin. Lê divê hînkirina

swêdî jî bê pêşxistin û berfireh-
kirin.

Li Swêdê ji 1ê tîrmeha 2009an
ve qanûnêk taybet a ziman he-
ye. Di nav zimanên din de, divê
zimanê swêdî bibe zimanê sereke
li Swêdê û swêdî jî bibe zimanekî
temamê piştgirîya civakî. Di
qanûnê de jî tê gotin ku mafê
her kesî yê ziman heye. Ev tê
wateya mafê fêrbûn, pêşxistin û
bikaranîna swêdî, zimanê xwe
yê hindikayiya neteweyî an jî
zimanê îşaretê yê swêdî, her wi-
ha mafê pêşxistin û bikaranîna
zimanên din ên zikmakî/dayikê.
Ger ew karibin van armancan
pêk bînin, swêdî û zimanên din
ên zikmakî yên li Swêdê xwedî
potansiyela pêşerojê baş in.

Gotina zimanê dayikê

Zimanê zikmakî an jî zimanê
yekem ew zimanê ku meriv
pêşî di zarokatiya xwe de fêrî
dengkirinê dibe. Kesek dikare
çend zimanên xwe yên zikmakî
hebin, ger di heman demê de
çend zimanan fêr bibin, mînakî
dêûbavên ku bi zimanên cihê
dengdikin, pîrzimanî bibînin.

Gotina zimanê dayikê di
swêdî de herî kêr ji sedsala
16an ve heye. Ew wergera raste-
rast a latînî *lingua materna* ye.
Di pergala perwerdeyê ya swêdî
de, zimanê dayikê îro dikare ji
bo hemû zimanên dayikê bê
bikaranîn ji bilî ku berê swêdî
-bi têgeheke şaş- jê re zimanê
malê dihat gotin.

Dema ku kesek zimanên din
fêr bibe piştî zimanê xwe yê
dayikê, ew wekî zimanê duyemîn
an biyanî tê bi nav kirin. Zi-
manek duyem li hawîrdora
ku ziman lê tê dengkirin, wek
nimûne di dema koçberiyê de an
di civakek pîrzimanî de tê fêr ki-
rin, lê zimanê biyanî li hawîrdora
ku ziman lê tê dengkirin nayê fêr
kirin, û armanca fêrbûna ziman
ne hewce ye ku mirov bikaribe
di civakên ku ziman lê tê axaftin
(zimanê dibistanê) de bijî.

Hersal 21ê Sibatê Roja Zimanê
Zikmakî ya Navnetewî ya fermî
ye, ku ji aliyê UNESCOyê ve
di sala 1999an de hatiye damez-
randin û ji wê vir va ye hersal tê
pîrozkirin.



Komeleya Ziman, Çand û Hunerê ya KONê ava bû

Adem Özgür

Li navçeya Kuluyê ya Konyayê, bi navê *Komeleya Ziman, Çand û Hunerê ya Konê* komeleyeke nû hat avakirin. Komele, piştî serlêdana li Qeymeqamtiya Kuluyê û pejirandina Walîtiya Konyayê bi fermî dest bi xebatên xwe kir.

Desteya Rêveber a komeleyê, ku ji heşt kesan pêk tê, beriya

destpêkirina xebatên giştî, di nav xwe de dest bi dersên kurdî kir. Berpirsên komeleyê diyar dikin ku ev gav ji bo pêşxistina zimanê endamên avaker hatiye avêtin.

Herî dawî komele dest bi atolyeyên zimanê kurdî kir û biryara vekirina atolyeya tembûrê jî hat dayîn. Lêbelê ji ber



pirsgirêka nebûna mamosteyê
tembûrê, ev atolye hê nehatiye
destpêkirin. Berpirsên komeleyê
destnîşan dikin ku ew ê di de-

meke nêz de vê pirsgirêkê çareser
bikin. Balkêş e ku piştî avakiri-
na komeleyê, gelek dê û bav ji
bo zarokên xwe ji komeleyê re

peyaman dişînin. Ev yek nîşan dide ku li herêmê hewcedariyeke mezin a hînbûna zimanê kurdî heye. Di vê çarçoveyê de komele dixwaze projeyên xwe berfireh bike û li salona konferansê ya şaredariyê konser û şanoyan pêşkêş bike.

Her wiha berpirsên komeleyê ragihandin ku ew ê di pêşerojê de medyaya dijîtal jî bi awayekî çalaktir bi kar bînin. Lê belê, ji bo pêkanîna van hemû armancan, pêwîstiya wan bi demê heye. Ji ber ku kêşeya nebûna kadroyan astengeke girîng e ku divê bi demê re were çareserkirin.

Tê payîn ku ev komele, di pêşerojê de, bi bernameya xwe ya dewlemend, dê bibe navendeke girîng a çand û hunerê li herêmê.

Di vekirina fermî ya 1ê sibatê de, girîngiya komeleyê hat destnîşankirin. Gelek kes beşdarî vê vekirinê bûn. Di nav beşdaran de, yek ji nivîskarên kovara *Bîrnebûnê* **Mem Xelikan**, hunermend **Serbilind Kanat**, parêzer **Levent Kanat** û kesayetiyên navdar ên herêmê hebûn. Serbilind Kanat ji mêvanan re stranek pêşkêş kir.

Serokê KONê **Rojvan Enes**, di axaftina xwe de wiha got:

"Em ê bêtir girîngiyê bidin zimanê kurdî. Jixwe hûn jî vê yekê dixwazin. Dema ku qala zimên tê kirin, tê gotin ku 'zimanê me dewlemend e.' Lê ez wek mamosteyê kurmancî dibêjim, zimanê me ne ewqas dewlemend e. Zimanekî ku neyê axaftin, nivîsandin û xwendin, nikare dewlemend bibe. Ji bo ku zimanek dewlemend bibe, divê em bi wî zimanî felsefê û edebiyatê biafirînin. Em jî wek Komeleya KONê dibêjin ku werin bi kurdî bixwînin, binivîsin û biaxivin."

Ji KONê **Melik Özkan** got: "Me ev komele ne tenê ji bo hewesên xwe ava kir. Me ji bo çand û zimanê xwe ava kir. Çima navê komeleyê KON e? Dema ku mezinên me hatin vê derê, di konan de dijiyan. Di bin wan konan de ev zimanê delal parastin. Em jî dixwazin di bin KONa xwe de zimanê xwe biparêzin û radestî zarokên xwe bikin." Özkan, piştî axaftinê helbesteke Mem Xelikan xwend.

Nivîskar û helbestvan **Mem Xelikan** di axaftina xwe de bal

kişand ser girîngiya komeleyê û wiha got:

"Hevalan tişteki pir baş kiriye ku dest avêtine vî karî. Em pê serbilind in. Wek hûn jî dizanin, kurdên Anatoliya Navîn beriya çend sed salan hatine vê derê. Kurdan zimanê xwe, çanda xwe û folklorê xwe parastine. Ev tişteki gelek baş e. Lê tişteki din heye ku zimanê me ber bi asîmîlasyonê ve diçe. Em çiqas bibêjin me zimanê xwe parastîye jî, zimanê me di bin bandora tirkî de maye. Me gelek hevok û peyvên xwe winda kirine. Lê xortên me yên îro wê li ber asîmîlasyonê bisekinin."

Siyasetmedar **Şaziye Sezer** jî qala girîngiya zimên kir û wiha got:

"Bi zarokên xwe re bi kurdî dengbikin. Ew ê paşê bi tirkî

dengbikin, lê niha bi wan re bi tirkî dengnekin. Hûn telefonan didin destên zarokên xwe û ew jî bi wan telefonan tirkî hîn dibin. Ger zimanê me bi teva bibe, tu tişt ji me namîne."

Parêzer **Levent Kanat** jî, di axaftina xwe de wiha got:

"Em ji bo tişteki pîroz li vir in. Ziman hebûna miletekî ye. Ziman hebûna çand û hunerê ye. Dijminê zimên asîmîlasyon e. Kurdên Anatoliya Navîn jî demê dirêj e di bin vê xeterê de ne. Zimanê xwe winda dîkin. Divê em li her derê bi zimanê xwe hem bi axivîn hem jî rast bi kar bînin. Ez spas dikim ji hevalên ku keda xwe dane vî karî re."

Rêwîtiya komeleyê

Melik Özkan

Sedsal berê kal û pîrên me li van axên ziwa bi cih bûne.

Li ser van axên ziwa konên xwe vegirtine û di bin konan da kokê xwe berdayîne. Tevî hemû ziwabûn û tîbûnê jî ew kok heta îro ziwa nebûye.

Nizanim ev kok kengî hatî berdayînê, lê tiştê ez dizanim ew kok ji gola xwê da hetanî çîyayê Nemrûdê, çemê Feratê, Lalişê û heta Xorasanê dirêj dibe.

Çend sal in di hundirê min da meraqê vî kokî û dilê min da tiştêk kêmbû. Ji bo vê kêmayî min dest bi rêwîtiyekî kiribû.

Li ser rêwîtiyê da min Rojvan, Fehmî, Elîf, Zeynep, Merve û Mahmûd nas kir. Ji ber ku ew jî mîna min ketibûn vê rêwîtiyê.

Yek ji van kesan Bedirxan an jî Bedirxanê Bedlîsî ye. Bedirxan ji Bedlîsê ye û ji ber karê xwe li Qulekê dijîya. Bedirxan jî di dilê xwe da dest bi rêwîtiyekê kiribû û di vê rêwîtiyê da Bedirxan li

me qelivî, me hevdu nas kir û me heşt heval dest bi rêwîtiyekê kir.

Li ser vê rêya ku me bi hêza yekîtiyê dest pê kirî, me fêhm kir ku rêya herî mezin gihêştina koka xwe, ziman û çanda xwe ye. Ji ber vê yekê me biryar da ku em komeleyek bi navê KONê ava bikin.

Sedema ku navê komeleyê kirîye KON ew e ku kal û pîrên me dema koç kirine konên reş vedigirtine. Ev konên reş di dîrokê da bûne sembola eşîra reşwan û hemû kurdên Anatolîya Navîn.

Di bin ronahîya van hemûyan da me heşt heval ji bo ku komeleya xwe bi awayekî fermî ava bikin dest bi xebatê kir.

Me siftê bi heval û hogirên xwe ra dest bi hevdîtinan kir û fikrên wan heyne. Herkesê ku me dît bi kelecaneke mezin em pêşwazî kirin û gotin ew ê piştgiriyê bidin me.

Di nav kesên ku me dîtî da kesên naskirî yê herêma me jî hebûn. Yek ji wan Mem Xelikan û yê din Levent Kanatî bû.

Rojekê ez û Rojvan ji Qulekê da ber bi Enqereyê çûn û bi Mem Xelikan û Levent Kanat ra hevdiştin pêk anîn. Me li Kizilayê

sohbeteke xweş û bi çayeke rind, me guh li şîretên Mem Xelikan û Levent Kanat dikir.

Me şîretên mîna zêr çikina xwe tijî kir û em hatinî Qulekê. Û me bi kelecaneke mezin li yekê sibatê me konê xwe vegirt û me komeleyê xwe vekir.



Çend gotin

Pir ne dûr e, li zarokatîya xwe da me jî bilî kurdî tu ziman ne dizanîn. Zanî li kêlekekî tu xebera me jî zimanên biyanî tune bûn. Li gor me li ser erdê tenê zimanek hebû an jî bi me weng dihat. Çimkî li mal, li nav civatê, li derva, di listikên me da her der kurdî bû. Heta ku em çûn mektebê, lê hînge me dît ku zimanên din jî hene, lê dîsa jî her der ji bo me kurdî bû, tenê li dersê zimanêkî biyanî hebû. Di tenefûsê de, di polê de, di navberê xwe da kurdî hertim dewam dikir. Em ewqas bi kurdî dijîn ku; kesên ji derva dihatin tevî me dibûn bi me re kurdî dievisîn...

Pir ne dûr bû dizanin, pir ne dûr...

Niha çi bû ye, zarokên me jî kurdî bêhtir her zimanê dizanîne. Du zarok an jî pismam, pixalti (gîştik li gor me êdî 'kuzen' in mixabin) digên hev di navbera xwe da şoreke tenê bi kurdî deng nakine...

Ew ne şûçê zarokan e, ew şûçê me ye. Şûçê kesên ku digotin 'li ser erdê tu zimanên din tune' ne... Wan kesan şoreke tenê bi zarokên xwe re bi kurdî deng nekirin. Kurdî ji wan re bû listikeke zaroketîyê...

Pir ne dûr bû lê me zû ji bîr kir.

Fehmî Karaçelîk

Ez tenê kesek im

Berîya her tiştî ez bi heyecana nivîsandina tişteki bi kurdî ya yekem car û şerma ku dereng dinivîsim hîs dikim.

Ez û hevalên xwe di vê kom-eleya ku me damezirandiye de armanc dikin ku hem ji bo xwe hem jî ji bo kesên din bibin ro-nahî.

Ji ber ku tenê tişteke heye em bi teqezî dizanin: Tu kes ji bo tarîtiya me ronî bike wê li me çirayê negire. Em roj bi roj dest bi wendakirina xwe dikin û ya herî xemgîn ew e ku haya me jê tune ye.

Em ciwanên ku hêvîyên xwe wenda nekirin in, em li bendê

nebûn ku kesek rêberîya me bike, me rêya xwe xêz kir.

Ji ber ku em dizanin ku ger em ziman û çanda xwe ji bîr bikin, yên din wê hêsanîr paşguh bikin.

Ez rojên bi hêvî li vir dihêlim.

Ez tenê kesek im, lê dîsa jî ez heme.

Ez nikarim her tiştî bikim

Ez hîn jî dikarim tişteki bikim;

Û tenê ji ber ku ez nikarim her tiştî bikim,

Tiştê ku ji destê min tê ez red nakim.

Zeynep Karatay

Serpêhatîya min

Bedirxan Ergul

Silav û rêz!

Ez Bedirxan 1998an da li Bolûyê ji dayik bûm. Kalikê min ji bona xebatê ji Bedlîsê hatine Bolûyê. Dema hatine Bolûyê tu kesekî kurd tune bûye. Di nava tirkên de bavê min, mamê min û metên min kurmançî jibîr kirine lê niha hêdî hêdî diaxifin.

Min dibistana seretayî, lîse û zanîngeh li Bolûyê xwend. Dema min heft sal berê kurdên Anatoliya nas kir ez di zaningehê de bûm. Ez gelek şa bûm û şaş mam ku ew 400-500 sal in li vê derê zimanê xwe, çanda xwe ji bîr nekirine. Tişteki gelek gelek hêja ye.

Paşê ji bona xebatê rêya min ket nava kurdên Anatoliya Navîn. Çar salan in li vir dijîm. Wê derê pir hevalên hêja min nas kir û me bi hev ra komele-

yek ava kir. Ji bona çand, ziman û hunerê. Em bi hev ra dixebitin. Daxwazîya me heta vê gavê zimanê me çanda me yên ku nehatine jibîrkerin êdî jî em ji bîr nekin.

Di vê rêyê da gelek kesan piştta me girtin. Ji Ewropa, gelek aliyên Kurdistanê û Tirkîyê da gelek peyama hatin ji me ra. Me dît mirovên me ewqas şa bûn ji bona komeleya KONê em jî gelek kelecana bûn. Ê di nava medyayê de ji me ra cih dan ew jî kelecaniyê me zêdetir kir. Niha fikra me em xebatên xwe bi disiplînê berdewam bikin. Her dem dengê me ser kurdên Anatoliya Navîn û ser kurdên her cihê be, em bibin sembolê kurdan vê erdnigariyê da.

Wexta ez biçûk bûm

Wexta ez biçûk bûm
Gundê me mezin bû
Mezinên me ciwan bûn
Ciwanên me jêhatî û jîr bûn
Ciwanên me dilşad û kêfxweş bûn
Rojek hat,
Rojekê ev rewşa hat guherandin
Yek bi yek ew ciwanên me
Derîyê malê xwe girtin
Baholê xwe heyran destê xwe
Ketin rêyeke dirêj û bi zehmet
Gihêştin axa ewropî
Ne dilşad bûn ne jî kêfxweş
Ne jîr ma, ne jî jêhatî
Gundên me jî tenê man, bêkes man
Bê berf û bê baran man
Çavên me jî li rêya man

Elif Doğan

Helbesta Melîkê Donê

Hela bila hîlbibe helbesta Melîkê Donê
Melîkê dil fireh û xweşxeber

Em li dor keçelê te bûnî yek
Henek li ser henekê li ser keçelê te
Te negot bes ji me ra carek

Ger tu nebûyayî, me çî bikira?
Bi mirûzekî tirş me li hev mes kira
Wateya kenê me tu yî bira
Gula civata Konê her tu yî bira

Hevalbend û hevrê yî tu
Derdguhdar î,
Sedema dilfirehîyê yî
Çavreş î, qehreman î
Ji cutkê heramî derketî
Navê xwe li dîrokê xistî

Keçelê te yê fireh
Yekîtîya me ye
Çiqas jê hez nekî jî
Ew bi me xweş e
Kona me ji ber keçelê te tim û tim geş e

Rojvan Enes



Bîranîna qirkirinê: Helebçe

Cemidandina êşê û li muzexaneyê nîşandina wê

Prof. Dr. Hacı Akman

Pêşkêş

Ev gotar hewl dide ku bi êşên cemidî re li ser jenosîda Helebçeyê rastdîtîni û têgihiştinekê bi dest bixe. Îro li navenda Helebçeyê cihê bîranîn û bîrdariyên (monomentên) cuda hene. Di sedsala 20an de, qirkirinên herî xerab ên dîrokê li gelek deverên cîhanê hatin kirin û ban

dorên felaket li ser wan koman hiştin. Di vê çarçoveyê de, li ser kurdan jî hatin kirin. Bi rûbirûbûna diyardeyek weha mezin, divê dîsîplînên zanistên bijîjkî, derûnî, siyasî, dîrokî û, nexasim, çandî, dîlnîzmî nîşan bidin, û hay jê hebin ku di warê têgihiştina pîşeyî de çi dikarin



bibin alîkar, û her weha bûyerên weha çawa ji raya giştî re bêne ragihandin, lê dîsa jî ne bi rengekî ku bibe sedema dûrxistina berpirsiyariyê. Em dikarin êşê bicemidînin û di çarçoveyên cihê de, di medyayê an jî di muzexaneyan de ragihînin, lê dînbûna mirovan hîn jî dijwar e ku were fam kirin û qurbanî dîsa û dîsa diqîrin: **”Divê tu carî neyê jibîrkirin!”**

Nêrîneka dîrokî li bûyera Helebçeyê

Helebçe li başûrê Kurdistanê ye û bajarekî çandî yê girîng bû. Beriya 1988an ji aliyê gelek kesan ve weke dilê pêşketina civakî

ya kurdî dihat binavkirin. Gelek zanîna rewşenbîrî û jiyana çandî ya kurdî li vir pêşketî bû. Helebçe bû metirsiyek ji bo rejîma despot a Sedam Husên, û çareserî ji rejîmê re ku tevahiya bajêr ji holê rake. Armanca rejîmê ya li dijî gelê kurd, qirkirina tevahî bû. Di navbera 1987 û 1989an de, nêzîkî 182 000 kurd hatin kuştin. Di êrîşa Helebçeyê ya sala 1988an de 6 000 kurd bi gaza kîmyewî hatin qetilkirin. Nebatên zêdeyî 3 000 gundên herêmê wêran bûn û piraniya şêniyan jî neçar man koçî cihên din bikin. Di êrîşa Helebçeyê de ji 6 000 kuştîyan piranî jin, zarok û extiyar hebûn. Ev çend saetan piştî êrîşa gaza kîmyewî mirin. Wekî din, zêdetirî 10 000 kes kor bûn, seqet bûn an jî bi awayekî din birîndar bûn. Paşê bi hezaran kes ji ber birînên ku di êrîşê de girtin an jî ji tevlihevîyên din mirin.

Lêbelê, divê were zêdekirin ku rabirdû tenê, heke em êşa wê vala nebînin, wateya rast distîne. Erê, em dikarin wek Ricoeur dibêje ne tenê ji bo serkeftîyên wan, ji bo



êşên wan jî deyndarê gelê kewnare ne. Tenê çîroka êşên wan nikare bêalî bimîne, lê dikare me hîn bike ku em wan dubare nekin, û bi vê yekê em wan ne tenê ji bo xatirê xwe, lê ji bo xatirê wan jî bi bîr tînin: Em deynê xwe bi bîranîna wan didin. (Brudholm, T. & Mennecke, M., weş., 2004, r. 129).

Ev nivîs dê li ser wê yekê be ku kurd çawa êşên xwe bi abîdeyê dicemidînin û çawa li muzeyan/ navendan pêşan didin. Ev yek wê bi bîrdariya Helebçeyê weke xala destpêkê bê kirin. Mirov dikare

di navbera abîdeyên cihûyan de, wek navendên Holokastê û abîdeya Helebçeyê, gelek wekhevî bibîne. Di her du rewşan de, ew têkildarî du komên etnîkî yên ku rastî çewsandin û kuştina komî hatine, ev jî di encamê de dibe sedem ku bîranînên bi êş bi arîkariya bîrdariyê li muzexane û bîranînên cihêreng bicemidînin. Ji ber ku *Bîrdariya Helebçe* û *Navendên Holokastê* gelek dişibin hev, ev nivîs wê teoriya ku cihû çawa bi abîdki-rina xwe êşê dicemidînin bikar bîne. Wê demê ev li hemberî

abîdeya Helebçeyê were danîn. Umberto Eco (2000) îdia dike ku estetîka nûjen me şert kiriye ku em tiştan wekî berhemên hunerî binirxînin tenê heke ew yekta xuya bikin. Tenê orîjînalbûn û nûkirina objeyê dikare hêviyên me bişkîne, wêneyekî din ê cîhanê bide me û hêviyên me nû bike. Di vê çarçoveyê de pêşangeha Helebçe bixwe bi çavekî estetîkî tê dîtîn û bûyer bi resim, wênekêşî û saziyan bi awayekî realîst ji nû ve tê hilberandin.

Pîvana siyasî tê dîtîn, dinav tiştên din de, li ber deriyê cihê bîranînê, ku tê de tabelayek hatiye daliqandin ku dibêje: "Endamên Partiya Baas qedexe ne". Pîvana îdealîst ew e ku divê *Enfal* dubare nebe, û ji ber vê yekê girîng e ku bêtir agahdarî derbarê bûyerê de ji nifşên pêşerojê re were veguheztin û belavkirin. Êş, qetlîam û qirkirin bi saziyên me yên ku bîranîn "cemidandine" û piştî nifş bi nifş têne vegotin.


Di vê çarçoveyê de divê berî her tiştî em piştrast bin ku agirê

bîranînan venemire. Ev yek tenê bi afirandina hestek berpirsiyariyê di nifşên pêşerojê de, û bi ewlekirina pêşerojê ji hêla her yek ji me ve hest bi berpirsiyariyek kesane dibe. Muze dikare hem li ser perwerdehiyê û hem jî li ser bingeha şahiyê wekî cîhek xwendinê were dîtîn. Abîdeya Helebçe weke cihê lêkolînê tê dîtîn, ji ber ku zanîna êrîşa gazê ya ku di 16/03-1988an de pêk hat nifş bi nifş tê derbaskirin. Civaknasê Fransî Maurice Halbwachs: Di pirtûka *Bîra Kolektîf* (*Collective Memory*) de, ew teoriyên xwe yên têkildarî bîra kolektîf vedibêje. Li gorî Halbwachs, hafizeya kolektîf di nava civakîya ferdî de tê çêdibe û ji nû ve tê afirandin. Li gorî vê dîtina hizirkirinê, bîr di serî de bi girêdana ferd bi civakeke sosyal re tê îfadekirin. Çarçoveyên referansê yên hevpar bi pêvajoyek domdar di nav komê de xuya dibin. Ji ber vê yekê rabirdû di parastina pêkhatayên civakî û çandî yên sosyal de roleke bingeîn digire ser xwe. Ew pîvana civakî di ramana Halwach de

dike xala destpêkê ya bingehîn di têngihîştina nasnameya kurd a dîasporayê de. Civaknasê îngilîz Paul Connerton teoriyên Halbwach ên derbarê bîra kolektîf de didomîne. Lêbelê, bala Conner-ton li ser çawaniya veguhestina bîranîna kolektîf/civakî ye. Vê yekê ji çalakî û çalakîyên rîtualî yên çandî dest pê dike.

Li ser bîr û bîranîn: meriv çawa êşê bi bîr tîne?

Monumentalîzekirina êşê li gorî çarçoveya ku tê de diqewime, ji aliyekî ve, bi pêşkêşkirina rabirdûyê di şeklê vegotinek kesane de, xwedan form û naveroka cûda ye. Ji aliyê din ve, rabirdû di çarçoveya civakî û çandî de ku di civaka etnîkî de pêk tê, dikare ji nû ve were vegotin. Sedema abîdkirina bûyerên rabirdûyê li ser daxwaza nîşankirina bûyerên girîng ên dîrokî ye. Di heman demê de, divê herêmek ku girêdayî çerxa etnîkî ye jî were ragihandin. Armanca pîrozbahiye, beriya her tiştî, ji nû ve avakirina nasnameyê ye, ne ku di qada giştî de ewleh bike. Ji bo



diyalogê çêbike û bibîne ku êş û azarên siyasî yên kurdan di çarçoveyên cuda de, hem di asta ferdî û hem jî di asta kolektîf de çawa xwe dide der.

Abîdeya Helebçe pêvajoyeke bi êş di dema borî de ku di civakekê de rûdaye vedibêje, lê bîrdarî nasnameyeke hevbeş jî diafirîne û di heman demê de cihê nîqaş û ramanê ye.

Ev ciyê abîdeya Helebçeyê bîranînek hildigire ku bandorê tevahiya grûbek etnîkî dike. Hem

li rabirdû, Îro û pêşeroja tevahî grûbê dike. Bîranîna şehîdan derbasî nîfşên ciwan dibe û bi bûyera rast ve girêdayî ye.

Bi vî awayî ev nîfşê ciwan jî dibe berpirsiyarê gihandina zanînê ji bo nîfşên pêşerojê. Ev dikare wekî êşek kolektîf were ceribandin, ji ber ku gelek bandor dibin û hêj bêtir nêzî wan in. Ji ber vê yekê êşa cemidî ya li abîdeya Helebçe kolektîf e. Li gorî Peter Kemp (2004) di gotara xwe ya li ser hêza bîranînê de, ew veng dibêje: *Bi rastî du sedem hene ku em jenosîdê bi bîr bînin: ji bo xatirê me û ji bo xatirê qurbanîyan. Û ev herdu sedem jî nikarin ji hev veqetin. Em jenosîdên ji bo xatirê xwe bi bîr tînin, ne ji bo ku pesnê xwe bidin ji yên din, lê ji ber ku bîranîn serpêhatiyêke rabirdûyê ye ku dikare tiştekî fêrî me bike ka em çawa tevbigerin, ku jiyanek baş ne tiştek bê guman e, qet garantî nabe, lê dîsa jî divê ji bo wî şer bikin. Bîranîneke wisa ne hewce ye ku me hîn bike ku em çî bikin, lê ew dikare me hîn bike ku em ji kirina wisa dûr bisekinin.*

Di vekolîna hişmendiya dîrokî de guncav e ku mirov ramana kolektîf û bandora takekesî ji hev cuda bike.

Li dîasporayê êşên monumentalîzekirinê

Meriv çawa û bi kîjan rêbazan dikare bîranîna êş û azarên dîasporayê û welêt bi dîtina ali-yên abîdeya êşên siyasî yên di warê dîtina siyasî û pêşketina nasnameya kurdî ya dîasporayê de bibîne. Çêbûn û pêkhatina dîasporayê cuda ye, dîasporaya afrîkî, yahûdî yan jî asyayî dikare were berhevkerin lê muqayesekirin zehmet e. Bikaranîna têgîna diyaspora bi hewcedariya danasîna têgeheke ku tevger an jî koçkirina mirovan a îro pêk tê ve girê dide. Peyva diyaspora yewnanî ye û dibe du beş; dia (bi rêya) û sperein (belav kirin). Li gorî ferhenga Merriam-Webster *Free Online Dictionary*, wateya peyvê ev e; ew ji deverê ber bi cîhek din belav bûn e û di destpêkê de ji bo belavkirina ci-hûyan li derveyî welatê wan piştî sirgûnkirina wan bi darê zorê ji

Babîlê hate bikar anîn. Îro ji bo kesên ku ji heman eslê hatine û heman welat îfade dikin ku li cihanî belavbûne tê bikaranîn. Destpêka têngîna diyasporayê rêwîtiyek e, lê ne rêwîtiyek asayî ye. Diyaspora koka xwe li cihekî din heye. Meseleya diyasporayê di serî de ne ew e ku kî, kengê, çawa û di bin çi şert û mercan de digere. Diyaspora, ezmûnên ku ji derbaskirina sînorên siyasî, aborî û çandî derdikevin holê. Aliyên dîasporîk ên qirkirinê ji nû ve tînin afirandin û avakirin, di utopyayê de hesta nasnameya kolektîf û welatê hevpar xurt dike.

Ji bo mirovên li dîasporayê, girîng e ku saziyên çandî yê herêmî, neteweyî û navneteweyî li hember bûyerên siyasî helwestek exlaqî bigirin. Awayê ragihandina bûyerên siyasî rê li ber afirandina şert û mercên nû vedike ku divê nasname tê de bînin veguhestin û parastin.

Ji bo kurdan, hem li Kurdistanê û hem jî li dîasporayê, piraniya parastina çandî di nav pêkhatiya etnîkî de pêk

tê. Ev rewş ne tenê fersendên pêşketinê yê kêm peyda dike, di heman demê de wî ji civaka biyanî ya ku ew parçeyek jê ye jî dûr dixê. Weke mînak dema ku bahsa belavkirina nasnameya kurdî tê kirin, di dîrokê de xwe dide der û taybetmendiyên cuda. Armanç ew e ku em bibînin ka jiyana rojane ya kurdan çawa berhema bûyerên dîrokî û civakî ye û ev serpêhatî çawa li dîasporayê tînin vegotin.

Monumentalizasyon li ser vebijarkên li ser tiştên ku hûn dixwazin ragihînin û hûn çawa dixwazin wê ragihînin ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê, agahdariya hatî ragihandin jî dibe ku hîlbijartinek siyasî ya rast be ku pêdivî ye ku were bîranîn. Abîdeya Halapçeyê qala bûyera hovane ya ku di 16ê Adara 1988an de qewimî ye.

Di abîdeyê de hîlbijartina siyasî ya rast bi rastiya tund a bûyerê tê raxistin. Ji şehîdan re cihê ku behsa hovîtiyê û eşan bikin û neviyên wan jî cihê ku şehîdên xwe bi rêzdarî û minetdarî bi bîr bînin hatin dayîn. Monumen-

talîzekirina bûyera Helebçeyê bi hîlbijartiyek bijartî ya sembolên cihêreng di van awayan de tê xuyakirin: Li ser deriyê derve yê ketina abîdeyên bîrdariyê peyamên siyasî yên wekî "Endamên Baasê nahêlin hundir" hatine nivîsandin.

Tabloya bîranînê

Cemidandina êşê û nîşandana li muzexaneyan an jî abîdekirina bîranînan pîrsgirêk e, ji ber ku neviyên wê ne xwediyê heman ezmûna bedenî ya Enfall, rejîma Seddam û bûyera konkret a Helebçeyê ne. Lêbelê, rola muze û abîdeyan ev e ku zanyariyên der barê êşê de ji nifşên ciwan re ragihînin. Pîrsgirêka belavkirinê mezin e, ji ber ku zehmet e ku zanyariyên derbarê êrîşa gazê û kuştinan ji neviyên şehîdan re werin ragihandin. Zehmetiya têgihîştina ku berê çawa bû û bav û kalên xwe çawa hatine bindest kirin, dikare bibe barek ji bo nifşên paşerojê yên malbatê yên ku heman serpêhatî parve nekirine.

Di abîdeya Helebçe de, êş bi wênekêşiya realîst û sazûmanên

ku ji nû ve avakirina belgeyên bûyerê nîşan didin, tê vegotin. Wêneyên wê weke kêliyên cemidî yên êrîşa Helebçeyê tên dîtîn. Temaşevan bi wêne û sazkirinan tenê beşek, kêliyek bûyerekê distîne û berdewamiyek bi vê kêliyê ve tê girêdan. Bi vê yekê, tê vê wateyê ku beşa wênekêşiyê dibe ya ku ji bo berdewamiya bûyerê derbas dibe. Berî û piştî kêliya cemidî çi diqewime em bi teqez nizanin. Di wêneyan de kêliyên hovane yên ku ji nifşên ciwan re derbas dibin nîşan didin û bi alîkariya wan divê mirov çarenûsa yekî ragihîne, wek mînak, Şerê Cîhanê yê Duyem û Helebçe.

Xelasî

Bala xwe bidin ser wê yekê ku kurd çawa êşê bi abîdeyê dicemidînin hem li welatê xwe û hem jî li dîasporayê. Binêrin gelê kurd çawa êşên xwe bi abîdeyê dicemidîne? Kîjan amûrên dîtbarî alîkariya cemidandina êşê û ragihandina wê dikin? Ev yek çawa li cih û navendên bîranînê tê? Bala xwe bidinê ka

çawa êşa siyasî û sembolên siyasî di abîdeyên cihêreng de têne destnîşan kirin. Sermaya êşê û pêşandana wê li muzexaneyan an li navendên cihê pîrsgirêk e, ji ber ku têgihîştina naverok ji bo kesên ji derve dijwar e (nemaze nifşên ciwan ên ku Hitler, Şerê Cîhanê yê Duyem û Rejîma Seddam nedîtine).

Ragihandina êşê dibe sedema ramanên nemirovane û nerast. Tişteki ku divê neyê jibîrkirin û divê neyê dubarekirin e. Tiştê tirsna ew e ku bi demê re mirov dikare ji zanîna li muzeyan têr bibe. Di demekê de, êşa xuyangkirî bi qasî ku berê şok dike namîne, ji ber ku meriv jê haydar e. Êşa di wêneyek ji bûyerek şerekî hemdem de dikare hê bêtir şok bike, ji ber ku haya me ji bûyerê tune.

Sermaya êşê û pêşandana wê li muzeyan/navendan jî pîrsgirêk e, ji ber ku, wek nimûne, bi wênekêşan an demên din ên cemidî (wek bûyerên cihêreng ên ku di muzexaneyan de têne hilberandin) em tenê beşek, kêliyê bûyerek distînin û ev kêlî

bi berdewamiyekê ve girêdayî ye. Demên hovane hene ku divê derbasî nifşên ciwan bibin, wekî qedera kesan bêt qalkirin, wek şerê cîhanê yê duyemîn. Êşên kîjan gelî li muzexane û navendan tîn pêşandan? Ma êş nifş bi nifş bêyî ku were gotin, rasterast derbasî nifşên ciwan dibe?

Abîdeya Helebçe xemgîniya li seranserê neteweyê bi bîr tîne û zindî dike. Ev êş ji ber ku di kombûna mezin a 16ê Adara 1988an de dirok her tim tê dubarekirin û bibîranîn. Pêşangehên li navenda bîranînê bi xwe peyamên bi hêz bikar tînin da ku qirkirinê bi wêne û filman ji nû ve biafirînin. Kombûna êş û bi cîhkirina wê di muzeyan/navendan de hem di nifşên paşerojê de û hem jî di bîra mirovan de bi giştî dikare di pêşerojê de kaosek ramanî çêbike.

Monumentalîzasyona li ser Helebçeyê weke navgîna ji bo bîranîn û vegotina karesatê tê bikaranîn û dê her tim li pey neteweya kurd be, ji ber ku nirxa wê bi têgînên bîr û hebûna kolektîf di civaka kurd de tê parastin.



Daxuyaniya pirsgirêkê:

- Çi stratejiyên muzexaneyên me hene dema ku li muzexaneyan li ser "jenosîdên dîrokî" radigihînin?
- Muzexane çawa dikarin, bi awayekî siyasî rast, bijarteyek ji dîrok û vegotinên qurbanîyan ragihînin, û paşê wan bîranînan ji bo tevahiya komê etnîkî bi kar bînin?
- Meriv çawa êşê dicemidîne û li muzexaneyan nîşan dide?

Çavkanî:

Brudholm, Thomas og Mennecke, Martin (Red.): (2004): *Erindringens fremtid. Auschwitz-dag i Danmark*. Lindhardt og Ringhof. Danmark

Connerton, Paul (1989): *How societies remember*. Cambridge University Press. Cambridge


Halabja monument (2001). Utgitt: Ministry of culture. General directorate of culture and art in Sulaimaniya. Directorate of Halabja Monument. Sulaimania

Halbwachs, Maurice (1980): *The collective memory*. New York: Harper&Row. New York.

Kemp, Peter (2004): Artikkel om Erindringens magt. I boken: Thomas Brudholm og Martin Mennecke (Red.) (2004): *Erindringens fremtid. Auschwitz-dag i Danmark*. Lindhardt og Ringhof. Danmark

Zygmunt, Bauman (1994): *Modernitet og Holocaust*. København.

Wagner, Thorsten (2003): "Holocaust i erindring og på museum" i Hans Sode-Madsen (red): *I Hitler – Tysklands skygge: Dramaet om de danske jøder 1993-1945*. Aschehoug.





KILAMÊN ME (XV)

Mem Xelîkan

KILAMA MEHMÎ NEÎM

Kilameke Xelîkên jor e şîna ye. Xelîkên Jor ,gundekî Kon-ya yî girêdayî ye bajarokê Kulu ye.Mehm. du-sê salî bû dayika xwe bi nexwaşîyekê wenda kirî bû. Ew. damarîya wî mezin kirî bû. Xortekî ji xwexaş,bengîn, xezkirî ye heval û cîrana bû.Bi qîmetê, bavê xwe û malbatê bû.

Wexta wî ya eskerî /leşkerî ye hat, bi dergîstî bû. Ew jî bi xortên gund ve ji bo vezîfe ya eskerî ye bi rêkirin. Dû xwe ve dergista xwe, dildara xwe û hezkirî yên xwe cihiştin çû.lê; mal şevitî ya felekê , tê bê yi ku ew ji mirinê re şandi

bû. Şêş mehan şûva, li wir bi derdê janazirav/ veremê nexwaş ket. Ji bo hewaguherîn û tedawî ye şandin mal. Bavê wî ew toxtor/ bijêjk bi toxtor gerand. Lê; toxtora ji derdê wî re tu çare nedîn.

Salekê şûva,1961 an bi wî derdê giran rehmetî bû. Hê pir xort bû, 21 salî wû. Bav, malbat û ya herî giran dergîsta xwe di nav êş û xemgînî ye da cihîştin bê wext çûyî bû.Dû mirina wî ve dergîsta wî bi pismamekî xwe re zewicî.Bavê wî û damarî ya wî ya ku ew wek dayikek heq mezin kirî bi kilama li jêr ew bi rê kirin.



MEHMÊ NEÎM

Hespe Mehmî min sise ne
Mîna motirê li ser sûsê ne
Koma min qurbane hawêsa dil da mayî
Didane zêrinî dev da dibrûsê ne

Malê yaylê li serê girin
Ne bar dikin ne diêwirin
Gare min bi hewêsekê
Ji bûka xwe re kirin
Xelkê jêkirin yê xwe bi şûnêva kirin

Xestexana Geçioranê bişevite li sînora e
Toxtorê bi ser Mehmî minî kibar ra
Dawestîyane qor bi qore
Min Mehmê xwe bire bîst-pênc toxtora
Gotin defer nêdîyinê ji derdê
Vî lawikî ser bi por e



Ankere bişevite ji me wêda
Bi ber xestexana ketim pêda pêda
Min Mehmê xwe yî kibar nedî têda
Min ezraîlê Mehmî xwe bidîya
Min canê xwe ye ji berva pêda

Dilê min germa havîn ê
Mehmê min çiçekê li devê îne
Gundo bûka min ji mehmê xwe ra
Bi hewêsa didan zêr kirî
Ê çaya siwê ji xelkê ra dikelîne

Ro ji bana narin bana
Lawikê bi dergîstî osan bûye
Ji toxtir û ji dermana
Bûka me huro li mala me raket
Min berbangê bi şuva bire xwedana
Telê bi tenê yî li eskere
Xermanê xwe yê mane li şûna xermana
Kekê min dipê ye derîya cîran a

Çi kibarî çi narine
Henî yê kiriye balîfê helnîne
Min go dergîsta te ye werê ser te
Go ezî zayifim ma min bi vî hali newîne
Fato tu cuyî hennê xwe mexemilîne



Zavî bûkê yî esabîyê naterkîne
Hespê Mehmî min timarkin
Nal û mîxe wana eyarkin
Malê yaylê bardikinê yaylê bûkê min wûnin malê
Mehmî min vi male yaylê ra barkin

Şeve şeve Mehmik şeve
Deriyê xestaxana berve heve
Bûkê emê nifira li te bikinî
Emê bînî ba li teşi ya te nekeve

Gere gere Mehmik gere
Bejna Mehmî min şivek ji zêr e
Bûkê çavê xwe heyne li zavê xwe mêzke
Metikê min qurban orxana ku vê rû mayî li pê sêr e
Te çima negot were
Canê xwe bi canê min biguhêre

DAYIKA STRANA ÊMA HEMÊ - III

Hızır Akbîna



Goristana gundê Celika-Kirkpinar – Kulu
Foto: Xello Dogan

ŞOR ŞORA ÊMÊ YE

Li doralîyên me heta iro jî tu
kesên mîna Êmê nehatine dinê. Ji
boyî vê jî kilamên Êmê jibîrnebûn.
Yên hîn jî, îro di nav cîmatê de
tên ser zîmên û tên gotîn. Êm ji
gundekî bû û bi malbata xwe re

mijûl bû. Êşên Êmê yên mezin
yek jî malbata keçîka wê Zex bû.
Mêrê Zexê di ciwanîya xwe da
mir. Êmê, ew parastin, destên
xwe bi ser ra girtin. Lî ser mêrê
Zexê kilam sirandin.

Kilama Îbramî Mexmê

Hespê Îbrêm lîlan e
Yî ji jêr da te giran giran e
Zexê korbîyê xwe pêgîne
Hespê bêsiyar, sîyarî bê zîman e
Edi were lo oflazo
Edi were lo boşboxazo
Te ji serî Zexê min dîna
Şar û toqazo
Were qiranî (pez) xwe pere av de
Bi dev nalê devziravde
Herik qîranî te nesekînî
Dengî bilûra xwe bi navde

Êm û Almas

Almas nevîya Ême bû. Yek a rind û xwaşik bû. Digotin dilê merîyê bi jin jî diketê. Li gundê Kırkpınar-Celîka da pir kesan ew xwestin. Yek ji wana jî lawê Omî Qeremilo Mexmik bû. Di salên berê de li şerê Çeneqqelê de birayê Mexmikê mîrîbû. Êm serdara gund û jî malbata Mexmîkê bû ku bî Mexmikê re got û şor dayê “tu jina birayê xwe lî xwe marke, ma sêwîyên birayê te li navbaran de nemên. Ez a te bi destên xwe bîzewîcînim.” Mexmîkê gotînên Êmê qebûl kirin û bi jina birayê xwe re zewicî û kete nav mala birayê xwe.

Sal derbas bûn û rojekê Mexmik çû ba Êmê û got min bîzewîcîne. Êm lî ser şora xwe dastî û bî destê xwe Almas da wî, Almas da ser hewîye! Elmas bi dergistî bû. Mexmik çû leşgerîyê. Êm bi va kirina xwe, biryara xwe pir poşman jî bû. Digot, “Min nêvîya xwe ya delal bi destên xwe avite nav agir.” Ji dolê Almasê re demeka kin hebû, Almas pir nexweş ket, malbatê xwest ma Mexmik we-

re gund û daweta wan bikin. Ji malbatê çend kes çûn Enqerê rica serleşkerê wî kirin ku ma ew were îznê. Lê mixabin yüzbaşîyê wî îzin nedayê. Sal derbas bûn. Mexmikê leşgerî teva kir, gêşte gund, hat ber mala Almasê ku wê bibîne. Almasê ew dî teqa malê re dît û bi pîrîka xwe re got, “Mexmik hatîye.” Derbasî oda xwe bû. Ji ber ku nexweş bû lî wir rûhê xwe teslim kir. Almas negiheşt miradê xwe. Xebera reş lî ser gundê Celika zû belav bû. Gundî bezîyan mala Êma Hemê. Şîn çêbû. Kesekî nedîkanî Êma Hemê sekinandi bide. Jinên malbatê ketibûn bin kolinca, Cilên xwe yên reş lî xwe kiribûn, kitan û şara we ji seri de ketibû ser mil, bi destên xwe serçavên xwe dirûçkandin û lî sîngê xwe dixîst û lî bermala xwe distira digot;

Here lê lê lê Almasê

Stû belek gerdan gazê

Almas a min tu mirad nedî

Ji dinê çûyê bê mirazê

An qurbanê lê Almasê

Stû belek gerdan gazê

*Almasa min kirê şûyo li ber çemo
Sawûn di dest da bûye lêmo
Yê bi dû kekê xwe gewas ketîyê
Dibê keko me re ez jî tem o*

*An qurbanê lê Almasê
Stû belek gerdan gazê*

*Dirêj bûye li ber çemo
Sawûn di dest de bûye lêm o
Damîş ne da du, sê ma
Dibê keko me re ez jî tem o*

*An qurbanê lê Almasê
Stû belek gerdan gazê*

*An qurbanê an qurbanê
Dola Almas a min kete gumanê
Jê re hatî je re hatî
Ma tu batayî mijarê şar û kitanê*

*An qurbanê lê Almasê
Stû belek gerdan gazê*

*Almas a min kirîyê şûya li ber malê
Qirinî ketê mîna karê
Mexmikê hat xemiland
Heyna bir kirê govendê, destê tismalê*

*An qurbanê lê Almasê
Stû belek gerdan gazê*

*Anqerê bişewite bû rû geşt de
Leşkerêya Mexmikî Omê ma
Di navbera yûzbaşiyê bê wijdan de
Mal şewitiyo îzinê Mexmikî Omê pê
de deh roj pêş de*

*An qurbanê lê Almasê
Stû belek gerdan gazê*

*Eskero!
Li ser dûganê ser dûganê
Tavê girtîyê ser xermanê
Zexê, Mircê xwe pêgînin
Gûcê nagê ga berdanê*

*Dilê min Hesik û Hecîyê
Her du bi hev re kirine topçîye
Dê kor a Hecîyê Min î
Dehûsê salî ye hîn î nîzanê tirkîyê.*

Ma ode jî dimirin?

Bêrîvan Keskin

Pîştî çend salên dirêj, min dîsa dest bi kişandina cixareyê kiribû. Min li ser kursîya li ber pencereyê bû xwe kişandîbû hev û li ber pencereya vekirî qurtek li dû qurta din li cixare dixist û min bi lez dûmanê cixare di ser piştî xwe re davêt û bi destên xwe dumanê cixareyê belav dikir. Qey tu dibê ez tiştêkî qedexe dikim, û wê kesekê aniha bi ser min de were û cixareyê di destê min de bibîne.

Bavê min xwe bi cixare kişandina min gelekî aciz dikir! Bi xwe re hemû mal jî aciz dikir. Xweda jê razî! Lê êdî ne bavê min ne jî kesekî din hebû ku qerîna xwe bi ser min xwe! Li vê dinyayê êdî ez û kêfa xwe bûm. Erê, êdî ez û kêfa xwe bûm! Îcar ew tirs ya çi bû? Ji kê ditirsîm? Ma ne êdî ez û kêfa xwe bûm? Bi vê gotinê re ji cihê xwe rabûm û min pencereya

vekirî bû ji nûve girt û vegeirîyam cihê xwe. Bi awayeke ji xwe bawer min piştî xwe da kursiyê û min cixareyeke din vexist. Min vê carê lez nekir û dûmanê cixare hêdî hêdî kişand nava cegera xwe û hêdî hêdî pifî nava odeyê dikir. Min di bin çavan re jî dilê xwe bi sîya min ya di camê de (ji min ve) bi hêza şêrekî xuya dibû şadikir. Di camê re dumanê cixareyê mîna sîyeke reş ji nava herdu lêvên min derdiket û li nava odeyê belav dibû jî xuyadibû. Herku dûman li navê odeyê belav bû, pir bû, reş bû û mîna ruhekî reş bi ser odeyê ve girt. Piştî xwe hêdî hêdî berdida nava dîwaran. Dîwar reş dibûn û mîna xewnerêşekê bi ser min ve dihatin.

Dest û pî li min sist bûbûn, min ji şûna xwe bazda û min pencereya girtî ji nûve vekir. E-yam gelekî sar bû. Ez ketim nav

nivînên xwe û min lihêf kişand ser serê xwe. Heya ew ruh ji odeyê derneketa minê serê xwe ji bin lihêfê dernexista.

Di cihê xwe de li roja pêşî ya bavê min cixare di destê min da dîtî difikirîm. Hey hawar, çi qerîn bi ser malê xistîbû! Ma ez destê wî digînim xwe? Min mîna pezkoviyekê ji ber şerê wî bazda û min xwe avêt paş piştâ dapîra xwe. Wê şevê ez li mala dapîra xwe di hembeza wê de ketim xewê.

Ji odeya yalî dengê du jinên bi hev re dikirin pistepist dihat. We pistepistê gelekî dewam kir. Li ser tiştêkî lihev nedikirin û biheraret liberhev didan. Piştî demeke dirêj dengê jinan kerbû. Mesele çibû nizanîm lê qey ez dibêm êdî lihevkin!

Deriyê odeya ez lê raketî bûm vebû. Wan jinan niha jî bi pistepist liberhev didan! Min xwe li xewî na. Wan jî êdî xwe kerkirin. Bêdeng di nava odeyê de bilez diçûn û dihatin. Radihiştin lihef û balîfan û di nivîngehê de bicih dikirin. Weng bilez û bez di nava odeyê de diçûn û

dihatin, û balîf ji ber serê me radikirin qey te digot siwaran daye dû wan. Dengê meta min ji odeyê bilind dibû "Rabin zûkin rabin, ez ji we re dibêm rabin."

Bi ser gotina meta min de, em bêçare ji nava nivînan derketin. Dema min di nava odeyê de li dora xwe nêrî, ode bi min tipûtal hat. Min bi xwişkên xwe ve li çavên hevdu nêrî. Li dora xwe nêrî. Kûlîlkên li ber pencereya odeyê bûn rakirîbûn. Kirlent û mînderên, ji bo ku cih ji nivînan re çebibe, me bi êvaran li jêrê odeyê didan ser hev jî rakirîbûn. Em kenîyan û xwişka min ji metata min re got "Xêrê metê? Em mala xwe bardikin?"

Dapîra min piştâ dabû dîwarê eywanê û li ser totan rûniştî bû, destmalek dabû ber devê xwe û dipilpili. Ew hal halê wê ye rojanê bû. Xwe dida alîyekî û di ber xwe de tim distira. Dema ku ez nezikî wê dibûm û min jê dipirsî ku ka ew di ber xwe de tim çi dipilpile, mîna ku ji xewneka şîrîn rabe digot "Kalê wê mîrxasek bû." Hingê min fahm dikir ku ew xwe bixwe bi kalê

min re diaxive. Wê wextê bi min weng dihat ku dapîra min jinekê xwedî hêzekê efsûniyê û bi wê hêzê jî bi mirîyan re, bêhtir jî bi kalê min re diaxive. Qey wê û kalê min zimanekî taybet ji xwe re avakiribûn û bihev re diaxivîn.

Ez hîn bi dapîra xwe ve mujil bûm, meta min a din ket hundir. Nêrînek avêt dapîra min. Dapîra min bi nêrîna wê re ji cihê xwe rabû, berve deriyê hewşê ve çû. Berê xwe berve sûsê ve kir, li arabeya ku ji dûr ve dihatî mêzedikir. Rengê arabe yê zer di nav mij de zor bela dihat naskirin. Taxiyeke bû. Bi vê re qerîn bi dapîra min ket.” Hawar bûkê hawar.” Cîran ji malên xwe pekiyan, qey di malên xwe li benda vê hawarê bûn! Arabeyakê reng zer hat li ber deriyê hewşê sekinî, bavê min jê pêya bû. Piştî wî meta mina biçûk ya ku demekê li naxweşxaneyê bajêr li ba dayika min bû ji arabeyê pêya bû. Min çavên xwe li dayika xwe gerandin. Piştî çavên min li sandoqa li jorê arabeyê bi kendiran ve

hatî giredan ketin. Ew sandoq çi bû? Dayika min çima ji arabeyê pêya nedibû? Dapîra min destên xwe dirêjî sandoqê kirin û lo-rand” Ma li min ba bûkê, ma li min ba, ma mirîna te li min ba.” Qerîna dapîra min, mîna bayekî cemidî li dorê belav bû û bi wê qerîne re hemû wext û demsal li min cemidîn.

Ez bi êşa destê xwe yê ku ji bin lihefê derketî û ji sermê tevîzî bû şîyar bûm. Min li dorê mêzand ne taxiya zer hebû ne jî dapîra min. Derûdor êdî ronî bûbû, dengê wesayît û mirovan bi ser bajêr ketibû. Pencere hîn jî vekirî bû. Destikê pencere yê ku min bi sergêjiya xewê rahiştî û kulîlka li ber pencereyê ku bêhemd zenda min bi pelên wê bûyî biqasî termekî sar bûbûn. Pepûk! Ev çi sir û sermeyê! Ma-se, kursî, xalîçe û heya diwarê odeyê jî sikîsar bûbûn. Mîna bedena mirovekî mirî spîçolkî û sar bû ode. Qey tu dibêje ruhê odeyê jê kişiya bû! Ma ode jî dimirin?

Dibe ku demek bê

Dîlan Kaya

Belê çîroka me di nav bê bextiya demê de bê xwedî mabû. Ev çîroka me û yên dine, ji ber ku her têkilî ji bo me ne barekê girane. Ev bar me derdixe rastiyeke û bi saya serê wî barî têdighêjin û dikemilin. Ji ber ku têkiliya me û jiyandinê di destpêka wêraniya me vir ve qet nîne, dê em dîsa jî tim dixwazin tişteki an jî tiştan biafirînin...

Em dilek in û çiyayî ne,

Em kenek in û deştî ne

Rojekê di taldeyê xeyalekê li me bipirsin û bibêjin hûn herî zêde ji kîjan ajalî hêz dikin, emê gelek ji wan ajalên çiyayî bi-hejmarin. Dê dema ez bi xeyalî qeraxê avekê rûdinê di şaxên dilê min de bezkovî berbi latan ve direvin. Xezal bejin û bala xwe dikin Xecê û Siyabend lingo lingo dilezînin.

Û çûkek ji qefesa min pir di-de li seranserê çiyayê welatê min Ala Azadiyê radike.

Her çiqas em xwedî xeyalan bin jî a ku aramiyê dide me hebûna me a ji gelek molekolan pêkhatiyê. Her çiqas wiha be jî a ku ji me re nîşengeh tiştên ne-tiştin. Ew tiştên ku wateya wan di kortikê dilê me de şinbûyî.

Caran me di şer û pêvçûyînekî de, caran di nav lîstika govendekî de û caran jî di hembêzeke germ de.

Dê dîsa jî jiyana ku em tê de dijîn rûpelê xwe yek bi yek li ber me vedike û dibe nûnera hiş û dilê me.

Her avayî û war agirê eşa xwe di nava xwe de dimexîne û bi van êş û eleman dibe niştecih.

Car caran ew kevirê ku ez di paxila xwe de weke çarmixa peyamber Îsa degerînim di nav

bîr û bawerîyan de dibe ronahî.
Çîrûska Manî ya ku di nav destê
hovan de temirî bû û bûbû se-
dama ku warek, erdnigariyek
bikeve hembêza tariyê.

Ev kevirê min ji zarokatiya
xwe hîlbijartibûn niha yek û yek
tên xwarê ji paxila min de û ew
wenda dibin û ez wenda dibim.

Serê xwe kire nava herûdo
destê xwe tiliyên xwe weke qey-
da di piyê Bozê rewan de haya
Mem jê nîn be û hêdi hedî goştê
canê wî bixwe, tiliyê wê jî goşê
serê wê dimhand.

Riya xwenasîna wê di nav
xeyalê zarokatiyê re derbas dibû.
Ev rê bi birînê ne kewitî çê bibû.

Ew bibû birîna birîndarê xwe,
ew bibû dara zeytûnê koka xwe
qelandibû li nav warekê avî de.

Ew dilê wê yê dêran, ew
dilê ku bûm û mişkan dixwast
ji xwe re bikin war; Bi çîrûsa ji
çîyan qetyabû dîsa xwe dispart
berxwederiyê.

Digot;

Her çiqas qeyd û benda hespê
min piyê wî, goşê wî bixwe jî,
her çiqas yên xwedî reşî û taritiyê
bixwazin warê min dagirbikin jî,
Çîrûsa Manî li esman diçûrise ji
bo min.

Em dilek in û çiyayî ne,

Em kenek in û deştine.

BI BEXŞÎNÊ
— **TEVLÎ PÊŞEROJA ZAROKAN BIBIN** —
DONATIONER
— **VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID** —

Swish.
Betala enklare.



123 356 67 91
Swish number



Li Kulu û Cîhanbeyliyê guherînên civakî û demografîk

Adem Özgür

Li Anatoliya Navîn, di nav kurdan de, bi taybetî jî li navçeyên Kulu û Cîhanbeyliyê, ji salên 1990'î û vir ve guherînên kûr pêk tên. Ev herdu navçe, ji aliyê nifûsa kurdan ve herêmên herî girîng ên Anatoliya Navîn in û di van salan de ji gelek alîyan ve hatine guhertin.

Jiyana berê û rewşa îro

Berê gundên van herêman geş bûn. Di her malekê de bi dehan kes hebûn, jin û mêr bi hev re dixebitîn, kurik di nav kar û xwendinê de mezin dibûn. Her malbat xwedî erd, mange, pez û bexçe bû. Çandinî û xwedîkirina pez karê bingeşîn ê herêmê bû.

Lê îro rewş bi temamî hatiye guhertin. Mesrefa çandiniyê - av, toxim, mazot û amûr - ewqas zêde bûne ku gundî êdî nikarin van mesrefan hildin ser milên xwe. Wek cotkarekî ji Celika dibêje:

„Em çi biçînin jî, em di bin barê deynan de ne. Ji zevîyan heydînin, didin kooperatîfê. Me berê genimê xwe diçinand, nîskê me hebûn, no-ka me hebûn. Îro em nikarin van birşînin.“ Li ser van mesrefan, bihabûna komirê jî barê gundiyan girantir dike.

Guherînên di warê aborî de

Di warê aborî de jî guherînên mezin çêbûne. Berê her malê xwedî şîr, penîr, rûn û genimê xwe bû û pêdiviyên xwe yên bingeşîn bi xwe dabîn dikirin. Îro ev tişt hemû ji bajêr tên kirîn. Wek pîrekeke gundî dibêje: *„Berê me penîr çêdikir, rûn diheland, şîr dimeyand. Niha em ji marketan dikirin. Lê tam û kalîteya wan ne wek yên berê ye.“* Ev guherîn bandoreke neyînî li ser aboriya malbatan kiriye û gelek malbat bêtê alîkariya kurikên xwe yên li derve nikarin debara xwe bikin.

Koça ber bi Ewropayê ve

Koça yekem di salên 1970î de ber bi Ewropayê ve dest pê kir. Ji Kuluyê pêşî ber bi Almanya û Awûstûryayê ve, ji Cîhanbeyliyê jî ber bi Danîmarka û Swêdê ve dest pê kir. Di destpêkê de, mêr û xortên xort diçûn, paşê bi rêya „vîzeyê malbatê“ jin û zarokên xwe jî dibirin. Her çiqas gelek xortên van herêman li Ewropayê bi cih bûne jî, têkiliya wan bi gund û çanda xwe re qut nebûye. Di havînan de li gundên xwe xaniyan ava dikan, lê mixabin ev xanî di zivistanan de vala dimînin.

Piştî derbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê (1980) û bi taybetî piştî Şerê Kendavê (Körfez Savaşı) di salên 1990'î de, pêla koçê xurttir bû. Şofêrên kamyonan ên kurd ku berê diçûn Iraq, Îran û welatên Kendavê, bê kar man û mecbûr man berê xwe bidin welatên Ewropayê.

Koça ber bi navçeyan ve

Di van bîst salên dawî de, ji bo xaza siruştî (doğalgaz) û jiyanê hêsantir, gelek gundî ber bi navendên Kulu, Cîhanbeyliyê û Konya ve koç kirin. Li gundan ne

tenê xwarin û vexwarin, lê her wiha mesrefên rojane jî pir zêde ne. Hebûna xaza siruştî li navçeyan bû sedem ku gelek malbat berê xwe bidin van navendan. Di sala 2012'an de, bi Qanûna Bajarên Mezin, gund wek „tax“ (mehle) hatin qebûlkirin û statûyên wan ên taybet rabûn. Vê yekê barê gundiyan girantir kir, ji ber ku êdî ji bo av û xizmetên din jî divê bêhtir vergî bidin.

Kêmbûna nifûsê

Li gorî daneyên TÛİKê (2007-2023), li van herêman nifûs bi awakî berbiçav kêmbûye. Li Kelhasanê di sala 2007'an de 1.837 kes hebûn, di 2023'an de ev hejmar daket 924'an. Li Qameran (Yapalı) jî di 2007'an de 2.296 kes hebûn, di 2023'an de tenê 1.270 kes man. Li gundên kurdên Cîhanbeyliyê bi giştî nivê nifûsê kêmbûye (*Tablo 1*).

Lê divê were zanîn ku ev hejmar ne yên rastîn in. Ji ber hîlbijartinên muxtariyê, gelek kes adresên xwe naguherin an jî beriya hîlbijartinan li ser gund tomar dikan. Her wiha, bi hezaran kesên ku çûne derveyî welêt hene ku

hîn jî adresên xwe bi fermî rane-
kirine.

Wendabûna ziman

Guherînên herî mezin di warê ziman û çandê de ne. Li van herdu navçeyan, kurikên ku li bajarên mezin dibin, êdî bi kurdî dengnakin. Li gundên mezin ên wek Încov û Omera jî rewş veng e. Pêşveçûna teknolojiya dîjîtal û astengiyên li ser zimanê kurdî, zimanê dayikê dixin bin xetereyê. Mixabin, malbat jî di parastina zimanê xwe de xebateke cidî nakin. Zarokên gundan jî ev panz-deh sal in bi tirkî dengdikin. Heta di nav dayik û bavan de jî êdî tirkî dibe zimanê sereke.

Xort û jiyana li Ewropayê

Xort, piranî ji bîst saliya xwe û pê ve diçin Ewropayê û li wir di karên giran de dixebitin: di fabrîkan de, di restoranan de, di karên avahiyên de. Gelek xortên van herêman li bajarên Ewropayê yên wek Koln, Graz, Kopenhagen, Den Haag, Zurîh û Stockholmê bi cih bûne. Li Almanyayê, Danîmarka, Hollanda, Awûstûrya, Swîsrê û Swêdê bi

hezaran ciwanên ji van herêman hene. Lê mixabin piraniya wan di nav civaka Ewropayê de bi zehmetî cih digirin û di karên giran de dixebitin.

Çareserî û pêşniyar

Ji bo çareseriya van pirsgerêkan, pêwîst e ku dewlet bi awayekî cidî piştgiriya aborî bide gundiyan. Lê ev bi serê xwe têrê nake. Divê:

- Ji bo ciwanan kar û xebatên nû bên dîtin,
- Çandinî û xwedîkirina pez bi awayekî nûjen bê kirin,
- Li gundên mezin ên wek Încov, Xelkê Dondirme, Xelikan, Kelhasan, Gundê Omê û Omera kooperatîfên xurt bên avakirin,
- Ji bo parastina zimanê kurdî navendên çandî û perwerdehiyê bên vekirin,
- Teşwîqên taybet ji bo xortên ku li gund bimînin bên dayîn.

Encam

Gundên kurdan ên li Kulu û Cihanbeyliyê di nav pêvajoyeke dijwar de ne. Ev ne tenê pirsgerêka demografîk e, di heman demê de pirsgerêka civakî, çandî û aborî ye jî. Heta ku ev pirsgerêk bi awayekî

bingehîn neyên çareserkirin, dê çanda wan, divê hemû alî - dew-
bandora wan a neyînî li ser civakê let, rêveberiyên heremî û civak
zêdetir bibe û dibe ku di demeke - bi lez tevbigerin û çareseriyên
nêzîk de ev gund bi temamî vala bingehîn pêk bînin.
bibin. Ji bo parastina van gund û

Tablo 1: Li Kulu û Cîhanbeyliyê Guherîna Nifûsê (2007-2023)

Navçe	Gund	2007	2023
KULU	Gundê Omê/Zincirlikuyu	2 153	1 768
	Xelikan/Karacadağ	1 924	1 591
	Omera/Ömeranlı	4 732	4 474
	Şerefli	327	282
	Canımana	1 192	972
	Hesar/Hisar	77	89
	Cûtikan/Tuzyaka	1 537	1 542
	Celikan/Kırkpınar	1 400	1 108
	Altılar	597	552
	Celep	1 188	1 635
CÎHANBEYLÎ	Kelhasan	1 837	924
	Qameran/Yapalı	2 296	1 270
	Încov/Yeniceoba	7 863	5 346
	Beşqawaxa Mezin/Büyükbeşkavak	1 587	1 274
	Xelika Dondirme/Gölyazı	4 036	2 453
	Gundê Bildux/Bulduk	2 180	1 249
	Hecîlera/Kuşça	2 579	1 249
	Kûtûga/Kütükuşağı	2 418	1 249
	Çîmanê/Çimen	574	366
	Cûtika/Günyüzü	2 389	1 940

Çavkanî: TÛİK

Li vî warî

Çavên xwe veke
Û
Xwaş mêzeke
Teyr û tû
Neman li vî warî
Hêlîn xelandî ne
Kew kevok û qulingan
Per û bask şikestî
Koçkirin ji vî warî
Dayikên hêvîyên xwe
Baskên wana de veşartî
Man e çav bi girî
Naxemilên e
Keçên çav kesk û wek morî
Reş girêdane
Bûkên dest bê hinne û çav kilnekirî
Baran jî nabarine
Li vî warî
Stûxwar û çilmisî ne
Gul û kulîlkên bihar şîndikirî
Ez
Kalekî xew û xevn bi nîvi me
Benda stêrka sibê
Bi lore lora dengbêjekê
Paşila xwe de
Hêvîyê dihevînime.

Mem Xelîkan

Dara Paça

Dara Paça
Li wê neqewê
Bi hesreta dilopa avê
Hişk û tazî
Bi tenê ma ye
Ne rêvîyek ne şivanek
Di sîya xwe de
Qet nekir e xewê
Bi desmalên
Keçên bermirad
Bi kitanên
Bûkên bi miraz
Reng û reng xemilîye
Ji wanan re
Omdî û hêvî ye
Kes nizane
Xêra xwe bi xwe tune ye.

Mem Xelîkan

Xewna kamiliyê

Siya Jandar

Ji nişkê ve ji ber dengê wê stranê ji xew hişyarbû, *Eş û elema emrekî*.

Dar û giyayê ji xortaniya wî mayî tev bûbû pûş û pelex.

Ew emrê ku di riya xirabiyê de pûç bûbû niha weke nivîşteke bê xwedî di stuyê wî de daligandibû. Stûyê wî bûbû têle tayê ku ji goreke rizî mabe dihejiya li ber bayê.

Bayek li min û wê rabibû. Berê me tim xeybê bû.

Dara emrê me riziabû, pûç bû.

Ew xwedayê ku xwedî peyker û bircan Ew guhê ku tim hêviya dia û lave kirinê.

Niha dojah ava dikir ji bo bêrîkirinê di çîyan de veşartî.

Ew cihê ku lê meya bû, ketibû hemlekî û bê destûr bibû xwedî laş.

Weke niquteke agir, weke çirûskek ji ber lamba cin û tebyan fir de di xana zemên de dîl mabû.

Ew bavê ku simbêl qeytan porê diya wî a kurkirî dihûnad Hûrgûlî li ser navmîla mirinekê gihîştîbûn hevûdo.

Weke du alên li berxwederiyekê de têkçibûyî.

Weke guleya dawîyê ya şervanekê ku di singa wî de bi cîh be Serê xwe bilinkir û dilorand di ser herûdo guliyê jêkirî de. Dayikek di qe-fesa xwe de du memikê bê şîr mezin dikir.

Ji bo zaroyekê ji nişkêve ketibê navlingê wê. Lorî û giriye wê ji hevûdo re du mar

Du marê korê û ziyangir.

Îsayê etîm di nav dil û hinavê min de her dan dibe qurbana
xwedê/xwe da

Bi hejmara tiliyan hatin û çuyînên bê wext dijmirim. Nava li
xwe dikim.

Ji bo mêraniya xwe zaroyan dikujim. Yanî!

Heke ku li demsalekê vegerim Pelên dara bihejmêrim.

Ez kujerek im.

Ji bilî navê xwe yê ku ji malzaroka diya min mayî Her tiştim.

Nameya çuyîne me Keça xama Hyptiya

Giriyê xwe dikesîne di qefesa wêranperestekî de Heke darek
bûma li Skenderiya çolekê

Wê kaxiz ji laşê min bifiranda Postikê min dax bikira

Û li ber deriyê bajêr biloranda

Bi tilîliya herûdo çavê min ji cîh derxista Ezê bibûma Yakûb li
ser kirasê wê korbûma. Ez im yê mal wêran!

Di bîran de

Deriyekim ne vedibim ne tîm girtin

Mifteya min di lambeya cinan de wendabûye Egîdê diya xwe

Şapat li warê te rabûye

Tu niha siwarê Hedmanî di şêrê jiyanê de hespê te ling şikesti-
ye. Tu diya çar zaroya yî. Nav li te kirine KURDISTAN Î.

Bîranîn:

"Cûtikên Heremî li ku ye?"*

Bilal Celepli

Min di sala 1973an de fakulteya tenduristîyê xelas kir û li benda tayîna xwe bûm. Rojekê xeta min hat; karê min û jîyana min a nû li gundê Tuzyaka (bi kurdî Cûtikên Heremî) destpê dikir.

Cûtikên Heremî li ku ye? Ez hemşîreka 17 salî feqet hîn keçikeka biçûk bûm; li gundekî kêleka Gola Xwê, li wî deşt û warî, li ew çolên xerîb, bi merîyên nenas va çing jîyana xwe berdewam bikim? Bi va pirsan û bi tirseka mezin dere rê ketim. Otobûs li Qulekê ez li ber qehwexaneyekê pêya kirim. Kesek tune bû. Tenê xortek li wir bû, min ji xort pirsî; „Vira Qulek e?“ got, „erê“. Min otel pirs kir, got, „tune.“ Min pirsî, „nexweşxane li ku ye?“ xort got, „ez e te bibim ber nexweşxanê.“

Me di rê de deng kir, xort jî li Enqerê fakûlta hiqûqê dixwîne. Min qala xwe kir, got, „tu îşev li nexweşxane rakeve sibê ez ê werim te bibim ber mînîbûsa Cûtikên Heremî.“

Sibê xort hat em tevûhev çûn cîhe mînîbûsa gund. Xort bi şofer re bi zimanekî cûda deng kir. Min pirs nekir va kîjan ziman e, feqet min li gund fahm kir; Cûtikên Heremî gundekî kurd bû û xelkê vir bi kurmançî deng dikine!

Şofer ez li ber mala mixtêr pêya kirim. Zivistan bû, eyamî sar bû. Av jî sar bû. Bermalîya mixtêr û keçika xwe ji min ra av germ kirin, min bi avê serçavên xwe şuştin. Sûfre dêhat, kesî nan nexwar. Li odeka paşi sûfreka mezin amede kirin feqet

* *Ayşe Can, di navberê salan 1972-73 li Cûtikên Heremî hemşîretî kirîye. Min bi rêya telefonê pê re deng kir, bîranîn û hîsên wê nivîstî.*

ez bitenê rûniştim. Min pir wext derbas bû şûnda fahmkir; gotinê hemşîre hîn kurikeke ya fedî bike bo we li sûfrê ma bi tenê rûne. Min dîsa jî fedî kir û tişt nexwar. Va hûrmet û mêvanperwerîya bo keçikeka 17 salî bû. Mixtêr xanik da min. 5-6 jin hatin ji min ra alîkar bûn û tiştên min bi cîh kirin.

Xaniyên Cûtika kerpîç bûn, toletên xwe li derva bûn. Av ji derva, ji kanîya gund tanîn. Li gund mizgeft, dibistan û dikaneka biçûk hebû. Hundirên xaniyan pir şîrîn bûn; li erdê û li diwaran xali hebûn. Xaniyên xwe yên jêr jî hebûn, li vir nanê sêlê bi hevîrtirş çêdikirin. Min hên pir bîra nanê Cûtika kir! Jinên gund xeftan lê bûn, hena jî xontê (şalvar) lê bûn; yên xonte li xwe dikirin, li pêşiyên wan jî pêşmalên (bermak) dirêj hebûn. Malên xwe bi kerma germ dikirin. Li ber çend mala qamyon û biçer hebûn. Xwediyên biçeran ji bo zevî çinandinê heta Adenê û Hetayê diçûn.

Li gund pirsêka min hebû; gundîya tirkî nedizanî! Bo we



Asker Kan

jî min deftereka xwe girt û çî bihîst ew dinivisî. Heger ku ez li vî gundî jîyana xwe berdewam dikime mecbûr bûm kurdî bihe-wisim. Rojekê xewer hat gotin jinekê roja xwe ya zayînê hatîyê. Bi ereba hespan hatin min bibin. Mixtêr got, „ez te, tenê naşînim bo wê bermalîya mixtêr û xasîya xwe jî bi min ra hatin. Em bi ereba hespa çûn zozanê. Zayîn bû, lawikek hate dunê. Min nezanî ez çing bêjim dergûşa we lawikê! Ez fikirîm û min sê caran serhev got; „Asker, Asker, Asker!“ Malbat gîştîk şabûn û jinên malbatê ez hemêz kirim. Navê lêwik kirin Esker (Eskerê Hecî Memed - Asker Kan, niha li gund dijî û 52 salî ye). Ji dayikê re mûjê

qewirandî anîn, dayikê bi nanê sêlê xwar. Ji min ra berxek serjê kirin û kelandin. Yê ji ber mayî jî dan e min, min bixwe ra anî mal. Dorê din jî ji min ra nan, mast, rûn û penêr hat şandin.

Di ew salana de pir keçikên li gund hatî dîwê navê xwe Eş bûn; bi min nav dikirin. Li Cûtikên Heremî navê Ayşe dibû Eş ya jî Eysîk.

Min gotî bû ya av ji kanîya gund dihat e anîn mala. Ez tu caran bitenê naçûm ser kanîya gund. Em, keçikên mehelê gîştîk tevûhev diçûn avê. Me zimanê hev fahm nedikir ema me hevaltîyeka xwaş derbas dikir.

Rojekê ez çûm dibistana gund. Ez fikirîm ku, ez a bi mamoste û bi malbatên wan va hevûdu nas bikin û ez a bi

wan re bi tirkî deng kim. Dibistana Cûtikên Heremî du mamosteyên xwe hebûn, herdu jî kurmanç bûn, jinên wan jî kurmanç bûn û tirkî nedizanîn. Va bi min pir balkêş hat; mêrê wan mamosteî dikirin feqet wan şûnedikirin tirkî deng kin!

Di sala 1974an di meha gulana de tayîna min rabû. Ji gund pir kes hatin ji min xatir xwastin. Ez bi tirs û hêşirkan hatim Cûtikên Heremî û dîsa bi hêşirkan ji gund derketim.

Salê min niha 68 in. Ez li ku kesên bi kurmançî deng dîkin dibînim têrim ba wan û dibêim, „çir dikî rind î?„

Min li pêşî pirs kir lê, „Cûtikên Heremî li ku ye?“ Cûdikên Heremî 50 sal zêdetir di dilê min da ye!

KERR KULLIKE SILÊVÎ

Me va çîroka ji gundî Mikaîla/Înler Köyü ji Taşoyî Yehmedî Macîr hilgirt, ew wêngê 78 salî bû.

Taşoyî Yehmed jî ev ji bavî xû bihîstîye. Li gor gotina wî, bavî wî piştî salê 1914an da ji doralî Muş Melazgirê, bi serî xû hatiyî gundî Avda/Hacimusulê û ji wir jî wek erebecîye malê Yîwişî Hec Ehmed tê gundî Mikaîla.

Bavê wî di salê 194an, di 60 saliya xû da di bin ereba hespa da dimîne û rehmetî diwe. Xwadê ji wî û mala wî razî be. Newiyên wî îro gundê Mikaîla şên kirine.

Wek tê zanîn niviskar Ahmed Aras jî ew destan di bin navî *Kerr û Kullik* da berhevkeriye û wek kitêp nivisandîye.

Di navbera herdû çîrokan da çend tiştên ji hev cûda hene û ji bo wê dixwazim vê versiyonê jî peşkeşî we, xwendewanan bikim.

Ji boyî vê, wî ew destan çîng ji me ra qal kirîye, me wekîna ji we ra nivisand.

Tiştêkî din ku di vir da bala min kişand jî ew bû ku herdû awayên vê çîrokê wek ya Siyabend û Xecê ye jî.



Husîne Tolê û Taşoye Yehmedî Macîr "Gundê Mikalîla

Yan jî meri dikari biwêji ku, kesên ku qalkirine herdû destanan yek cara tevlihev kirin, bi zanîti yan jî nezanîtî!

Navê camêrên destanê di herdû avayî çîrokê da wek hev in.

Wek mînak; Ahmed Aras ji dayika Kerr û Kullik ra gotiye Werdê. Taşoyî Yehmed digot Werdê. Me jê pirs kir, ka vateya Werdê çi ye, wî nedizani ew tê çi manê, vate yê!

Ahmed Aras diwêji “Kerr û Kullike Silêmin”, Taşoye Yehmed diwêji “Çîroka Kerr Kullike Siliwa” yan jî Silêwa.

Di ya Ahmed Aras da dût û dirêj qala bavî wan, camertîya wî û hatina çîroka wi tê kirinê. Lê di ya Taşoyî Yehmed da tu qala bavî wî nêye kirinê. Dibe ku hatiye jibîrkirin.

Di herdû versiyona da jî navî hespî Kerr Sosik e.

Navî hespî Mîrî Ereba “Bîlîcana Mîrî Ereba” yî.

Navî keçikê Emer Axa Perîşan e, yanê wek hev in.



KERR KULLIKE SILÊWÎ

Berhevkar: Dr Mikailî

Li wî memleketî Emer Axayek hewûyi û ji hêlê nêziki mîrî Erewa wû yi.

Mîrî Erewa xadiyê hespekî bi navî xu Bîlîcan bûyi, Bîlîcana Mîrî Erewa!

Emer Axa keçikek xu delal û bedew bi navî Perîşan hewû yi. Keçik gir bûye, rindê wek wê tunne bû ne!

Salê wê zewacê hatiye. Dîlî pir xorta di wê da bûye.

Emer Axa gotiyi kî ji min ra “Bîlîcana Mîrî Ereba” hanî, eze keça xu Perîşanê bi emrê Xwadê bidim wî.

Kullik jî navê Perîşanê bîstîyi û dilê wî jî di Perîşanê da wû yî.

Kullik birakî xuyî mezin hewûyi û navî xu Kerr bûye. Bi Kerr va bavî xu ne yek bûne, ji dê da birayê hev bûne.

Ji Kerr ra diwê bira, emê herin Bîlîcana Mîrî Erewa bînin û

Perîşanê ji min ra hilgirin. Kerr diwê bira, ku Werd vê bibîhize nahêli em herin!

Kullik diwê em xeberê nedin Werdê, ku wê bihîst, me naşîni!

Berbanga siwêzû radiwin û derdikevin rê.

Werd radiwi vê dibihîzi, he-spî xu ji tavlê dikşîne, lê sîyar diwi, tere hindê Emer Axa.

Diwê; Emer Axa, tiştik bi zaro min were, ez ê serî we gîştikan jêkim.

Werd jinika pir camêr û wêrek bûyî.

Werdê radiwi, dide pê zaro, gede xu.

Kerr û Kullik mêze dîkin ku parava dumanek radiwi ku wek qiyamet e. Kerr ji Kullik ra diweje; birawo ka em li benda bisekin.

Sîyarekî meriya zêde,

Qedake meriye kêr!

Sîyar tê digêheje wan ku dîya wan, Werd e.

Werd li zarya ra nîfira diki, diwê heta ku qîrîna min nekeve gûhikî we, hûn ruhî xu teslim nekin, canî xu nedin!

Vana mêze dîkin ku sîyarekî din jî li dû wan tê. Tê digêjî wan ku ew Nehmete Îso yî.

Nehmet jî dile xu di Perîşanê da wûyî û dixwazi bi hûzî û çî-na hêsp bîni û Perîşanê ji xu ra bixwazî.

Nehmete Îso tim li hûzî û çî-na digerîyayi. Diwê ka eze çito xerawiyê li van bikim.

Ew bi şev radiwi, benî Sosikê ji sêrî dişehitînî û Sosik tere ava miriqê veduxi û zik lê diperçivi, diwi def.

Vana sivê radiwin ku Sosikê zik perçivî yi. Ew Sosikê digerînin ku bira perça xu dakevi.

Mîratî dasqûn e,

Eme çito ji vir derbas bin.

Dê diwê hûn ji ku nî? Hûn nizanin ku ew mîratî Dasqun e.

Ew diwêjin em rêwî ne.

Diwê; Na na hûn rêwî ninin!

Hun Kerr Kulike Silêwî ne, ji bo Bîlîcana Mîrî Erewa hatinî?

Ew jî ji malê Hesi Dudê wû yî. Dotmama wan bû yî. Yanê xalane Kerr û Kullik in li hêla Êla Erewa.

Cardin ji wana pirs dike; Hûn Kerr Kulike Silêwî ne?

Ew diwêjin erê.

Mala Hesî Dudê, birê Werdê
li hêla Erewa rûdinîştîwûne.

Diwên ka eme çito Bîlîcane ji
xu ra biwin.

Ew diwê;

Berbang a siwê dorî saet penc
an şeşan hêsp tînin avê.

Hevsarîki herîrî li seri yî,

Ji tasika zêrîni da li ber kevrî
elmasî da avê xu wêdixî û terî.

Ku we hesp li wir bir, bir! ku
ve nebîr ewe herî!

Kullik xu di paş dîwarî ka-
niyê da vedişêrî, mêzedîki ku
xortik hespeki tîni avê.

Kullik derdikeve ber diwê;
Ka va hespe kê yî?

Seyîs û xizmetkar diwêjin;
Ma tu kor î! Ew Bîlîcane Mîrî
Erewa yî!

Ku ew war diwêji Kullik
heryekî kulmekê lêdixî û Bîlîcanê
ji dest wan hildigrê.

Mîrî Erewa vê çito dibihîzi,
meri xu berhev diki û dikevi dû
wana.

Kerr û Kullik va ji dûrva hati-
na sîyarîyan diwînîn.

Kullik diwê; Tu ditirsi ji wan?

Kerr diwê na ez natirsim.

Berxê nêr ji bo kêr!

Diwê eme Bîlîcanê çî bikin.
Diwê eme teslimî Nehmetî Îso
kin. Heta ku şer diqedî bila ew
lê binêrî.

Nehmete Îso li Bîlîcanê siyar
diwi, rîya heftakî di du roja/rîya
da xu digêjîne mala Emer Axa û
diwêji min Bîlîcana Mîrî Ereba
hilgirt û ji we ra anî, ka keçîka
xu Perîşanê bidî min, ew para
min e!

Perîşanê wekî soz dawûn di-
din wî.

Perîşan derdikeve derva kêrê
dide destî xu û fincanîki jî tîji
zehîr dikî, diwê; Eger hûn min
bidin Nehmetî Îso eze vê zehîrê
bixwum û xu bikujim!

Heta wêngê ji kon jinek
Erewa derdikeve ku guli sor in,
heta erdê dirêj diwin. Me tu ji
bo xatîrî vê jinîkê da. Ew jinîk
nebûyana me ye serî te jêkira!

Heta wêngê malê Erewa terin
xu davêjin Malê Husî Dudê, xa-
lanê Kerr û Kullik.

Mala Hesî Dudê û Mîrî Erew
li hevûdi sê bûne.

Mîrî Erewa ji Husî Dudê ra
diwê;

Namus li seri yi, ne li ninga yi!
 Du gur ketin nav me, em gî qirr kirin.
 Êla Erewa di ber xu da pispîsikî kirin.
 ”Ew cêwre malê me ni.”
 Mêze dîkin ku xoceki cerê diki, yanê parsê diki.
 Diwêjin; Xoce tu ji kuda teri?
 Mala Hesi Dude şeş mêr sîyar diwin.
 Xoce xetê dîdî destî wan.
 Diwê; min zani ku wana cêwre dêlê me ne!
 Lê ku mala Hesî Dudê sîyar diwin, peya nawin!
 Ew jî sîyar diwin.
 Mêze dîkin ku pa ra dumanik radiwi ku, tu yê bê ordîki tê.
 Kerr diwê bira vana mala Hesî Dudê ne.
 Mîna gurên seri çîya ne, mina quma behra ne!
 Wî wîîîîî..... (Dengbêj li vir klamê distire.)
 Ewana tên digêjin hev û dest bi şer dîkin.
 Camêrtî ya Kerr bû yî, navê Kullik hewûyî.
 Herkes Kullik camêr dihesiwîni.
 Boyî wê ji wana çar terin ser Kullik,

sê kes jî terin ser Kerr.
 Xal naxwazin wana bikujin.
 Boyî wê bi hers lénaxin.
 Kerr jî naxwaze wan bikujin, lê Kullik cên ji wan hildigre.
 Bo kuştinê li wan dixîni!
 Lê hespe wî Sosikê miriq wexarî wû û nedikarî bû baş bazdî.
 Qamciya xu li hêsp dixî, hesp ningê xu yî pêşiyê digêjin kêlekê lê, ningê paşiyê dikevin nav miriqê û nikari xu ji wir xelaske.
 Her çar xal xu digêjinê û rimê li piştê wî dixin, Kerr cê mêze diki ku her sê yê din jî çex wî bûn, ew hema xu dighêjini wî, Kullik diqşîne hêlikê.
 Çelpik heri davêji devî hêsp û ranaw van dikevi, şeşa ji wana dikuji. Yek ji wan dimîni.
 Diwê bira eze vî ji bikujim.
 Bira diwê; Na bira, wî mekujî, bira ocaxê mala Hesi Dudê kor newî!
 Ew bi quna şûrî xu li seri xali xuyî çûk dixî û seri wî dişkênî, tutina xu dîdî ser, xun ji seri da heta ber ninga diherike jêr û wî dişîni malê.
 Vana nêzikî mala xu diwin;
 Kullik diwê; bira te pênc

birayê Werdê kuştin, ku ew bi mir le tu ye Perişanê bi Kerr dî.
vê bizani, ew a te bikuje. Emer Axa diwê;

Min bavêji ser hêsp, ku de- Mi da Kulik? Mi neda Kerr?
sti min li hêla min li ba biwin, Lê bi rastî Emer Axa ji Wer-
Werde bê haaaa, dunya akîna dê ditirsayî, Werd jinikeka pir
hatiyi, ew ê akina jî here! camêr û şûrî xu tûj bûyî.

Werd li ser qonaxê xu, li wan Ew emrê dide ku bira haziri-
mêze diki ku ew ê têne û dest li ya şenahî û dawata wan bikin.
hêlê badiwin, Û heft ro heft şeva ji wan ra

Bi xu xuva diwêji; haaa dunê dawatê dikin.
akîna hatiyî û ew ê akîna heri, Ewna digêjin mirazî xû.

ew fehm diki ku ew ê bimirê û xu ji ser xêni da davê jêr.

Digirî û diqîrri...

JÊRÊNOT:

Kulik ji ser hesp da tê xarê û Bîlîcan îro navê derekê, çîyayekî
dimiri, Werdê jî lê nifir kiriwû li Bulanik a Muşê ye. Li vir ere-
ku heta ku qîrîna wê nekevi gu- bên Bidirî dijîn û bi kurdan va jî
hikî wî, ew nemire. merivtî çêkirine. Werdê navekî

Emer Axa ji tê hindê wana.

jina yên mesîhîyan e. Li vê na-
vçê berê file jî pir bûne.

Werd diwê Emer Axa Kulik

Ahmed Aras koça dawî kir

Dema me ev hejmara kovarê ji bo çapê amade dikir em bi mirîna nivîskar, siyasetmedar Ahmed Aras hesîyan. Em bi koça wî ya dawîyê xemgîn in. Bila serê malbata wî û hezkirîyên folklorê kurdî sax be!



Ahmed Aras di sala 1944an de li gundê Melle Osman ya Qereyaziyê hatiye dinyayê û 14ê adara 2025an de çû ser dîlovaniya xwe.

Ahmed Aras bi nivîsandina epîka *Evdalê Zeynikê*, *Weşanên Deng* nav dabû. Ji derveyî ev herhema wî ya girîng çend kitêbên din jî nivîsibû; *Kerr û Kulik*, destan, 1993 (Li Swîsreyê bi zimanê Almanî hatiye çapkirin.)

Siyabend û Xecê, destan, Îzmîr, 1993
Serhildana Seyîdan û Berazan, *Weşanên Pêrî*

Red.

Ez aşê sebrê me

Xizan Şîlan

her şev
hestên min yên tevzînok
di nalîna stranên keserkûr de
mest dibin
qedera sersem
li nav qermîçokên eniya min
konê xwe vegirtiye
bêşansiya salên kambax
xwe li stûyê şadiyên min
alandiye
ji asîmanên bihara rengîn
xwelî û xubar li ser xewnên min
dibarin
dilê mesûm
li nav parsûyên jihevketî
kutekut e
alfabeya temen
di deftera demsalên piştxûz de
tarûmar bûn
kovanên mijgirtî
bi qefesa salên westiyayî ve
hatine daliqandin
çirûskên zanyariyê
di asoya ramanên şêlû de
direqisin
li newalên hinavên min
karwanên sebirê
derbas dibin
ez
li bêxewiya şevên kor
heyveroniya derûniya xwe me
li dengvedena kendalên dirinde
derwêşekî gerok im

di rêya êş û xeman de
rêwîtiyê dikim
li aşê serkeftinê
êşkenceya çaxên genî
dihêrim
mucîzeyên jiyana nependî
di wîzewîza bayê dîn û har de
kifş dikim
kelkela birînên kezeba xwe
bi maçên xunava lêvên yarê
dikewînim
şûrê zaliman
li ber nefsbîçûkî û xweşbîniya xwe
ditewînim
tenêtiya giyanê xwe yê qefilî
bi kirasê hêviyên nîvcomayî
dipêçim
li nav bagera tirs û endîşeyan
xwe li siya xeyalên tewîşî
radigirim
ji pêşîra rojên bêbext
meya kêfxweşiyê
dinoşim
mîna çiçekên bêhnxweş
di qelşa qolincên zinaran de
dipişkivim
û geş dibim
ez ê
wek volqanên serhêldêr
biteqim
û di mêjîyê xêrnexwazan de
agir bipijiqînim

Helbest

Seyfî Doğan

li ser riyên ku ez dimeşime
ezî dengvegerîya
xemgîniya xwe dibihîzime
şopên jêbirin
kanîyên wêrankirî
silav pir tê dîtin
xizmên tamên xwe wenda kirî
ji xwezayê dûr ketine
empatî ye hestyarî kêr
kulîlkên teze yen ku
di zerîya agirê qûmê de dişewitin
bedewîyên çilmasî
ezî dimeşime
rêvitîya min biparêze



ezî li stokholmê me
ewrên çiriya paşinên Mijdarê
li ser serê min
û li ser asfalta şil dimeşine
ez diçim kîtêbxanê
da ku sîya xwe neavêje ser kîtêban
ezî ewran li derve cîhtîlime

Qerfo

sîyasetmedar
li agora
neynik şikeşt

aştî
cesareta rewşenbîra ye
humanîsm

berfê ji mêvanperwerîye
adarê heznekir
xwe heland

pisîk li benda mina ku
xwe li cîhê min bi şûn bike
deme ronakbîrîyê

mij û dûmane
rîya rast
hevîdarî

zimanê min
di devî min da
qûlot bû

Quto

piştî baranê
rojê
rengên agiran vêxist
pelên payîzê
li ber bayî biharê
berbang

şivanî bi bilûrê
ji jinan re

li ziravên biharê têxê
şevê
bîranînên rojê
parzûn

hekatêân nuh ateş
û helbestên mem xelîkan
darên haeneran

piştî baranê
rojê
reng vêxistin

berf helîya
lêh herikî

bîranîn şewitîn
bayî biharê
darên hîşk hîşyar kirin
ronêsans

pelên payîzê
li ber bayî biharê
berbang

Seyfî Doğan

FEDÎ

Mehtab Îdelî

Fedî çi ye?

Fedî hesteke tevlihev e ku em hemû pê dizanin lê nikarin bi tevahî tarîf bikin. Dema ku em dixwazin bersivê bidin, em dibînin gotin li ber me diçin û em lal dibin. Çima; ji ber ku fedî ne wek hestên din e. Her çend ew ji nêz va bi tirs, hêrs û xemgîniyê va girêdayî be jî, ji aliyê din va hesta "fedîkirina ji fedîkirinê" arasteyî mirov dike ku verşêke. Ew jî fedîyê, ji hestên din cuda û ravekirina wê dijwar dike.

Berî ku em bikaribin fedîyê tarîf bikin, divê em bizanibin ew çawa di laşê me de xwe dide der:

- Germahî di rûyê me de belav dibe û rû sur dibe.
- Dil bi lez lê dide.
- Dest û nig dicirifin.
- Zik tevlihev dibe.
- Çav nikarin li çavên kesên din binêrin.



- Mirov dixwaze ji wê derê bireve û di wê kêliyê de bibe avek û bikeve erdê.

Ev nîşanên fizîkî jî ji me ra dibêjin fedî ne tenê hesteke derûnî ye, ew di hemî laşê me de belav dibe. Psîkolog dibêjin ku fedî bandora xwe li ser her kesî cuda be jî, yek ji hestên herî bingeher ya mirova ye. Wek sîhek tarî, carina li pey me tê û carina li ber me dadiste. Ya girîng ew e

ku em wê nas bikin û bizani-
bin kîngê divê em guh bidinê û
kîngê divê li ser bisekinin. Em
nikarin bi tevahî ji fedîyê xelas
bibin, lê em dikarin hu bibin ku
çawa bi fedîyê ra bijîn.

Îcar têkilîya fedî û eybê çi ye?

Têkilîya di navbera fedî û eybê
de gelekî balkeş e. Belkî li gor
hinekan herdu jî heman tişt in.

Lê li gor hinekan jî:

- Fedî; rewşa kesekî xwe şermezar
hîs dike nîşan dide ye yanî hesta
ku piştî kirina eybê çêdibe ye.
- Eyb; normên ku civak li ser
mirov ferz dike ne - yanî edet û
qaîdeyên civakî ne.

Ew norm, temînkirin û parasti-
na nîzama civakî armanc dikin.
Ji ber vê yekê fedî ji hêla malbat
û civakê va tê hukirin û di pêva-
joya adaptasyona jiyana civakî
de hesteke neçarî ye.

Yanî civak me bi "eybê" va
sînordar dike û em jî bi "fedîyê"
poşmaniya xwe nîşan didin.

Ew zincîra bêdawî ye ku per-
gala civakî pê tê parastin.

Ji çi û çima tê fedîkirin?

Di jiyana rojane de mirov dikare
ji gelek tiştan fedî bike:

- Xeyal û daxwazên kesane.
- Xuyanga fizîkî.
- Derdor û malbat.
- Nasnameya etnîkî.
- Têkilîyên civakî.
- Tevgerên "neguncaw".

Bandora fedîyê li ser jiyana civakî çi ye?

Her çend fedî carina dibe as-
teng jî, di jiyana civakî de roleke
giring dilîze.

Aliyên erênî:

- Sinorên exlaqî diparêze.
- Ji tevgerên nebaş diparêze.
- Nîzama civakî diparêze.
- Rêzgirtina di nav civakê de
zêde dike.

Aliyên neyînî:

- Pêşîya pêşketina kesayetî digire.
- Dibe sedema pirsgerêkên
derûnî.
- Gelek caran dibe asteng li ber
azadiya kesane.
- Dikare bibe sedema wendaki-
rina derfetan.

Fedî di nav civaka kurdî de

Fedî di her civakê de heye, lê di her civakê de bi awayekî cuda tê dîtîn û bikaranîn.

Di civaka me ya kurdî de, fedî xudî wateyeke kûr e. Ji zarokatiyê heta pîrîtiyê em huyî "fedîyê" dibin. Dayik ji keçên xwe ra dibêjin "eyb e!", bav ji lawên xwe ra dibêjin "eyb e!" û civak ji her kesî ra dibêje "eyb e!" Lê gelo ev eyb her tim di ci-hê xwe de ye?

Di nav malbatên kurdan de, fedî bi taybetî ji bo keç û jinan wek "nirxek" tê dîtîn. "Kêça şermok" tê pesandin. Lê gelo ev pesandin ne astengek e li ber pêşketina wan. Ew wan ji pêşveçûnê, ji xwe derbirrînê û ji afirandinê dûr naxe?

Di heman demê de, fedî ji bo mêran jî heye, lê bi awayekî din. Mêr "divê" bi hêz bin, negirîn, hestên xwe venêşînin - ev jî cureyeke din a fedîyê ye.

Yanî di civaka kurdî de, fedî bûye amûrek ji bo: perwerdeyîya zarokan, kontrolkirina tevgerên mirovan, parastina nirxên civakî, birêvebirina têkiliyên

nav malbatê û diyarkirina sinorên exlaqî.

Ji ber van sedeman, di civakên kurdan ên kevnar de gelek normên bi eybê va girêdayî hene. Ez dixwazim piçekê li ser wan norman bisekinim.

Di nav malbatê de:

- Li ber dê û bavê cixarekişandin eyb bû.
- Li ber mezinan xwe dirêj kirin eyb bû.
- Di nav axaftina mezinan de axaftin eyb bû.
- Zarokên xwe hezkirin û li ber mezinan bi navên wan bang kirin eyb bû.
- Li ser sifrê axaftin eyb bû.

Di nav zewacê de:

- Berî xwazgînîyê keç û xort hevdu dîtîn eyb bû.
- Aşkere çûna dergistî eyb bû.
- Keça bi dergistî diviya xwe di nav civakê de, kombûnekê de, di dawetekê de, li şînekê her dem ji dergistiyê xwe verşêkira. Ger wer nekira eyb bû.
- Di nîşan û dawetê de, çûna zava bo mala bûkê eyb bû.

- Di dawetan de jin û mêr bi hev ra reqisîn eyb bû.
- Roja dawetê, zava heta êvarê li mala xizmekî xwe verşêdikir û êvarê dihat malê. Eger ew bi rojê bihata, ev eyb bû.
- Jin û mêr li ba mezinan bi hev ra axiftin eyb bû.
- Eger keseke ku nû bûye bûk, heta mehekê xwe ji xezûrê xwe û mêrên din ên malê verşênekiriba, eyb bû.
- Li ba xesû û xezûrê xwe rûniştin û axaftina bûkê eyb bû.
- Xwarina bûkê li ba xezûrê wê û mêrên din ên malê eyb bû.
- Dema ku bûk ducanî bû, eger xwe ji bav û birayên xwe verşêneke, eyb bû.
- Dema bûk li derva dengê xwe biling bike eyb bû.
- Eger jina ducanî zikê xwe ji mêrên civakê verşêneke, eyb bû.
- Dema zarok çêdibû, li ba mezin û mêran nidikanibûn di hemêza xwe de bigirin. Eger ku bi tesadufî li derva bi mêrekî re rû bi rû diman, zarok çî dibe bila bibe li herdê

dihîştin û bêyî ku li paş xwe binêrin diçûn. Piştî ku ew mêr ji wir diçû, dihatin radikirin. Ger wer nekin eyb bû.

- Dema wêne dihatin kişandin, ku mêr û jin destên hev bigirin an jî destê xwe dînin ser milên hevdu eyb bû.

Di nav civakê de:

- Li ber mezinan rû bi rû rexne kirin eyb bû.
- Di nav mêvanan de dengê xwe bilind kirin û zêde axaftin eyb bû.
- Dema mezinek diaxift yê biçûk dengê xwe bilind kirin eyb bû.
- Bi mezinan ra li ser heman text û minderê rûniştin eyb bû.
- Bi mezinan ra li ser heman sifrê rûniştin eyb bû.
- Dema mezinek an jî mêr dihatin, jin ranebin û rê nedin wan eyb bû.
- Rûniştina jinan li ba mêran eyb bû.
- Jinan oxira mêran birrîn eyb bû.
- Nezanîna rabûn û rûniştina xwe eyb bû.

Di warê kinc û kolan de:

- Serê jinan vekirî bû eyb bû
- Pêşîra jinan vekirî bû eyb bû
- Keç û jinan şal û şapik li xwe kirin eyb bû.
- Kincên tenik û teng li xwe kirin eyb bû.
- Kinc û bergên jinan ên ku bedenê nîşan didan eyb bû.
- Kiras û fîstanên kurt ji bo jinan eyb bû.
- Xemilandina zêde ji bo derketina nav civatê eyb bû.
- Kin û kolên ku edeta civakê qebûl nedikir eyb bû.
- Kincên bi rengên geş û balkêş eyb bû.
- Çîpên tazî xuya dikirin eyb bû
- Xortan porên dirêj berdan eyb bû.
- Xwe wek jinan xemilandin eyb bû.
- Mêrên ciwan bi şerwal û kincên fireh nediçûn civata mezinan eyb bû.

Di warê xwarin û vexwarinê de:

- Li ber mezinan bênişt cûtin eyb bû.
- Destê xwe berî mezinan dirêjî

xwarinê kirin û dest bi xwarinê kirin eyb bû.

- Beriya mêvanan dest bi xwarinê kirin eyb bû.
- Li derva, li ser piyan, li ser rê sekinî û xwarin eyb bû.
- Li pêş mezinan av vexwarin eyb bû.
- Li nav civatan zêde xwarin eyb bû.
- Li ser sifrê rûniştî mayîn piştî xwarinê eyb bû.
- Li ser sifrê lingên xwe dirêj kirin eyb bû.
- Berî mezinan ji ser sifrê rabûn eyb bû.
- Di nav civatê de tiştêk vexwarin bê ku pêşkêşî mezinan bikî eyb bû.
- Piştî xwe dan sifrê û xwarinê eyb bû.
- Devvekirî xwarin û vexwarin eyb bû.
- Di dema xwarinê de bi dengêkî bilind çepilandin eyb bû.

Di warê perwerdehiyê û kar û xebatê de:

- Xwendina keçan eyb bû.
- Xwendina kêçan li dibistanên tevlihev bi kuran ra eyb bû.

- Jin di kargehên de bi mêran va tevlihev xebitîn eyb bû.
- Jinan li bazarê kar kirin eyb bû.
- Keçên ku di karên derva de dixebitîn eyb bû.
- Jinan serbixwe kar kirin û pere qezenç kirin eyb bû.
- Keç û jin di di nav bajêr de bi tenê gerîn eyb bû.

Ew norm û eyb di demên cuda de û li gorî herêman dihatin guhertin. Îro gelek ji van norma hatîn guherîn û hinek jî bi tevahî nemane. Di roja me de formên nû yên eybê derdikevin holê. Di

medyaya civakî de eybeke cuda heye. Nakokiya di navbera modernîte û kevneşopiyê de dibe sedema eybeke nû.

Ev jî nîşan dide ku civakeke modern jî nikare bi tevahî ji fedî û eybê rizgar bibe, lê dikare wan moderntir bike û li gorî pêwîstiyên demê ji nû va şîrove bike.

Lê belê, li derveyî van normên ku me li jor hêjmartine, ma tiştên din tunen ku mirov û mîrovatî jê fedî bike? Helbet hene; dagirkerî, komkujî, talan, destdirêjî, neheqî û zordarî ...

Lê mixabin hinekan perda henîya xwe qetîya ye!

DÎROKA HUNERA TEVNÊ, XALÎ Û KURD

-II-

Muzaffer Özgür

Di sala 1995an de li welatê Çêkya li gaz ên Pavlov kûzek hat dîtîn ku ew îspata forma zivirî ya honandinê ye û bi 25 000 sal BZ ye.

Li Israîlê dî şikefta Nahal Hemer de parçe hatîn dîtîn, ew ji 19300 sal paşva terin.

“Li welatê Parsa amûrên lûx gelek bûn. Xaliyên honandinê û hewreşîm li her aliyên qesrê hebûn.” Arrîanûs di pirtûka xwe de bi taybeti behsa xaliyên hatinî honandin dike. (*Arrîanûs, Anabasis Alexandrîs / sefera Îskender*).

Fêylezof, dîrokzan, nivîskar û leşkerê grekî, Ksenefon (BZ.431-354) di pirtûka xwe ya “Vegera Dehhezaran” de behsa parsa û gelên ciranê wan wek berhemên hirîyê xali û kilav bi kar anînin dike.

Di kolandina Çayönü ya Amedê de arkeologa di sala 1992an de parçeyek qumaşê bi şikleka modern hatîye raçandin dîtîn. Ew qumaş 7000 sal BZ. tê bi sal kirin. Ew parçe di cihanê de mînak yekemîn tê qebûl kirin. Dîsa lî başûr li nêzî Sûleymanîyê di cîhe Carmo de arkeologa qumaş dîtîn. Ew berhemên Carmo ji yê Çayönü hîn jî kevnar in (*Izady, Kürtler, Doz-Istanbul-2004*).

Li Kurdîstanê dema çanda Halaf (BZ. 6000-5400) de qumaşên rengîn hatine dîtîn.

Marco Polo (1254-1324) di gera xwe de tere Misûlê û li bazara bajêr de qumaşên bi pemû hatin honandin dibîne (*Marco Polo, Ger 1*).

Bi van agahdarîyan, ji bo rêzenivîseka qurt dikanîm dîroka

honandine ji bo xwendewanên xwe bidim nasîn. Lê dema min bêşên gelt û xaliya nivisandin ya were dîtîn ku agahdarîyên ji dîrokê yê berdewam bikin.

Berhemên honandinê

Ez dixwazim bi pêşdabirina teknîka honandinê ew berhemên derketine hole bi kurtayî bidim nasandin.

Qumaş, destpêkê de wek perçe te honandin û li ser hev tê dûrandin.

Çal, telis ji bo veşartina malzeme, cîl û berg, ard, xwê û xarina heywana cûr bi cûr hatiye honandin.

Têr, Ji bo li heywana barê xwe barkin mezin û ji bo barê xwe bi mîlê xwe bibin biçûk hatiye honandin.

Cîla hespa, xûdanê hespa ji bo hespa ji bar û xwezayê biparêzin bi kar anîne.

Gore, ji bo lingê xwe biparêzin amade kirine.

Tûrikê desta (diravan), Ji bo karê rojanê malzemê xwe tê de veşêrin û bi xwe re bibin derekê hatiye amade kirin.

Telik (kum), Piranî ji bo mêr a hatiye honandin ku ma serîyê xwe pê biparêzin.

Gelt an jî xaliyê nimêjê, ji bo li ser nimêj bikin hatiye honandin.

Mînder, Ji bo li ser rûnin tê amade kirin.

Ber, Tej, Perde, di destpêkê de ji bo kon a wek ode ode ji hev veqetînin bi kar anînê. Di malan de jî him wek diwarekî hatiye bi kar anîn him jî ji bo parastina mal û milkê xwe. Wek amûreka rexistinê jî hatiye bi kar anîn. Di nav kurên Anatolîyê de gotina Perda Sêr pir tê nasîn. Wek parçe an jî mezin e.

Balîf, ji bo jîyana xwe baş û xwaş, bî kêf be, pişt a xwe bidin ser hatiye amade kirin. Di konan de paşê jî di mal û konaxan de wek amûreka rexistina malê hatiye honandin. Di nav kurdên Anatolîyê de jî cîhekî xwe yî taybet heye. Ez ê li pêş çend resma ji kurdên Anatolîyê wek mînak belavkim.

Kon, bi filikê bizina perçe perçe tê honandin û ew perçe li ser hev tên dûrandin. Konê reş ji ber

ku Kurd koçberbûne hebûneka gelek bi fêde bûye. Koçberan ji ber ku xwe ji xwezayê biparêzin konê reş wek malekê bikaranîne.

Gelt, parçeyê mezin e ku wek amûrekî rexistina malê hatîye honandin. Min çend mînak ji dîrokê dabûn lê ji ber ku gelê kurd pir bi kar anîye li ser vê bêşê ez ê bisekinim.

Xali, însana ji bo kon, mal û konaxên xwe rêxin amade kirine. Bi xali honandinê re tevn gehîştîye asta bilind û bûye huner. Di cîhanê de cîhekî xwe yî taybet heye. Xaliyên gelên Aryan, gelên Tirkoman li ser dinê gelek tên nasîn. Mijara nivisa min ji xali honandine û ez ê li ser berfîrehi agahdarîya binivisînim.

HIRÎ

Li gor agahdarîyên di dest me de, di dema Neolitîk de mî/pez hatîye kedî kirin. Hirî bingehiya honandine ye. Pez li bihara paşîn (gulan-hezîran) tê qusandin. Ji ber havîna germ hîn nehatîye pêz ji germahîye tê diparêzin. Hirîya baş ya van mehaye.

Cîhê pêz were qusandin tê rêş kirin/pakij kirin. Qusas mîyê li ber xwe dirêj dike û her du lingên paş û yê çepêyî pêş dike nav û bi hev re baş girêdide. Bi abring/ havring/ habringê ji jêr de berjor hirî tê birîn. Di dema nû de ev kar bi meqesên bi elektrîkê kar dîkin te kirin. Pez qusandin di nav gel ên koçber,



Çavkanî: Mehmet Ali Baran (Mamo Film)



Benê ji bo girêdana mîyê

di nav gel ên bi pêz re mijûlin
bûye kulturekê

Pêz qusandin xelas bû û hat
pakij kirin bi şunde, jin li ser ava
kanî, çêm û gol an hirîyê dîşon.
Hirî bi avaka zelal bê amûrên
kîmyaye tê şûştin û bi darên ha-
tin amade kirin te kutandin. Ava
zelal nermokîya hirîyê pir dike.
Hirî li ber tavê tê rêxistin û zûva
dibe. Hirîyê dikin telîsa û ji bo
were rîsandin tê amade kirin.



Habring

Ji bo veçirandinê gundîya bi
xwe jî hirî li şê (fotoyê li jêr)
dixistine. Carcaran jî bi destên
xwe vediçirandine. Carcaran jî
bi şivekê tê dihatîye kutandin.

Car caran jî ji bo pakij be
hirîyê li vitikê dikin. Vitik navê
makîneya hirîyê. Li nav gundê
Anatolîya Navin heta salên 1970
kesek hebûye navê xwe Halil
bûye, û li gunda digerîyaye û hirî
pakij dikiriyê. Pê re digotine,



Ji arşîva, Niels E. Pedersen (DK), Gundê Celika-Yeşilyurt sal 1986
Çavkanî: Rûpela FBê ya Bulduk kasabası



Şêyê ji bo hirîveçirandinê hatiye bi kar anîn.
Çavkanî: Medya sosyal

Xelê Vitikê. Dema hirî bi vitikê te pakij û nermik kirin, qelîteya xwe zêde dibe. Hirî tê veçirandin bi vê re elastîkiya xwe nermik di-be. Dawîyê ji bo teşîyê amade ye.

RÎS

Rîs ji hirîya pêz, ji filîkê bizina hatiye çêkirin. Navkirina rîs, ji hirîya bi teşîyê hatî rîsandinê te. Gelên bi pêz re mûjil in hirî û filik hezar sal in cûr be cûr bi kar anîne. Lî welatên Asyayê jî hevrişim hatiye rîsandinê. Rîsandina rîs ji bo honandinê hatiye bi kar anîn.



/4

Jin, bi teşîya hirîyê dirêsin û hirîyê dîkin rîs (ben). Ew rîs ê hatî amade kirin dibe gilok û ji bo amûrên cûr be cûr werin amade kirin tê veşêrin.

Bi rîs re teknîka tevnê dikeve konaxeka nû. Bi rîs, tevn kirin ji bo amûrên derketinê holê, êlastîkî, herdemîn (saxlemî), nermokî, badayî û ji xwezayê parastin hîn baştir çêdibe.

Di dîrokê de hirî rîsandin, teşî bi kar anîn gelek caran lî ser kevîran hatiye neqş kirin. Du mînak li jêr in.



Arşîva Antropolog Jan Hjärnö (DK)/
Gundê Hecîlera-Cihanbeylî

BZ. Sedsala 8an / Hitît. Çavkanî: Rûpela
FB. ya Arkeolog Zaze Mahabadî.
BZ. Sedsalên 9-6, Susa/ Elam/Lûr.
Çavkanî: Rûpela Iranika-FB. Û Wikipedia

Rengdan/dan (Boyaxkirin)

Bi rîs re jî rengên bên amade kirinê derketine hole û bi cûr be cûr ji nebatên bi dest xistin boyax hatiyê çekirin. Boyaxa nebatî hezar salin ji alîyê mirovatîye va hatiyê bi kar anîn. Ji ber ku boyaxên nebatî pir salan tarê narin û bingehîya xwe teva nabe, hatiyê bi kar anîn. Rengên nebatî pir sal derbas bin jî ji rengên xwe çilmişî nabin û her dem bi şevq in. Ji bo rîs jî pir hêja ne.

Ji bo rîs reng bi reng amade bibe tê boyax kirin. Kurdên Anatolîyê bi vî karî re dibêjin DEN. Ya Denvan, dencî (kesên karê den ê dike) tên gunda an ji gundî rîs ê xwe dibin bajara ba denvan a. Dema denvan tên gunda, di biroşên mezin de av bi êzing an jî kerme û kuşkîra (ji gom a heywana tê derxistin, pîsîya heywana ye) tê kelandin û ji bo rîs rengîn bikin û ji bo reng were bidest xistin jî madeyên pê reng bi dest bikevin

tên avêtin nav biroşê. Ji bo rîs baş renga bigire gerek bên germ kirin. Bi wê re rûn e hirîye dihele û hîn baştir rengîn dibe. Dû re jî demekê rîs tê kelandin. Ew kelandin li gor piranîya rîs, li gor reng û boyaxê tê hesab kirin. Kelandinê bişunde jî ji nav ava rengîn tê derxistin û demekê tê zelandin dû re jî ji bo were zûwa kirin tê rêxistin.

Gel ên koçber ji ber ku di nav xwezayê de dijîn ji bo renga bidest xistinê gelek hebûnên xwezayê bi kar anîne. Ax, pelên dar an, mêwe, mîz a heywana, cûr be cûr gîha û kok û pelên wan, çend mêş û moz a, xwîn ê rengên baş hatine afirandin. Rengê spî, rengê hirîyê bixwe ye û bê boyaxa. Rengê esasî jî sor, zer û heşîn e. Hemû rengên din ji van sê renga lihev xistinê derdikevin holê. Kesk, reş, gewr, mor, portaqalî li hev xistina renga an ji bi serê xwe ji berhemên nebatî derdikevin holê.

Dengê bêdewletîya min

II

Xoyretînê Mihemmedî Seîd

Kurd im, bê dewlet im. Bêdewletîya mim wek sirgûnîyek dûdirêj ku xortan kal dike, poran spî dike di nefesêke da. Û wek helwdanêk bêdawî ye.

Şêrek şer dike li ser gora min. Dibê rabe lawo, rabe û şer bike.

Dibêjin em ê li ser konê bavê te komarek demokratîk çekin ku bi navê tirkên te xwendin. Dizêk derva dike goristana min. Diranên mirîyan difroşin li bazarên diza.

Kurd im, bê dewlet im. Bêdewletîya min dibe sedema kûştina nevîyên min. Nevîyên min dikûjin li ser erdên ku ji Enqere ye, ji Tehran, Bexda û Şamê qedîmtir in.

Şervanêk dikola gora min. Dixwazê ku çekên xwe veşêre. Dibê rabe lawo, rabe û şer bike.

Min got: Şervano, dayik bi qûrbano. Tu şer dikî lê gûr û çeşal dixwin keda te.

Got: tu çekên min bigire hevalo, ez têm.

Çû, lê nehat tu caran.

Kurd im, bê dewlet im. Bêdewletîya min ne bu bihûşt û ne jî bu dojah bo min. Li arafê mam. 50 mîlyon mirov min dît li araf e. Ji ber bêdewletîya min Xûdê te'ala ne dizanî çi bike. Bêdewletîya min bû mijarêk girîng li mehşerê.

Ezraîl canê min dikşîne bi lêz û bêz. Min got ecele neke lawo, ez ji arafêkê diçim arafêkê.

Got: "Cano ez jî bindest im. Ji min re çi gotine ez wê dikim."

Kurd im, bê dewlet im. Bêdewletîya min ji sirgûnîya Misirê ya cihûyan dirêjtir e, ji jenosîda aborjînan girantir e, ji xwewa ashab-i kehf kûrtir e.

Lê ez niha rabûm piştî 300 salan û ez edî ranekevim.

EŞÎRA CÎHANBEYLÎ Û EŞÎRÊN TÊKILIYA WÊ

Yusuf Kaynak

Di şûna rexnekirinê de, min gotara îroyîn da nasandina teza lîsansê: *Eşîrên Cihanbeyliyan û Çêbûna Sosyal-Aborî ya Eşîran*; Ev tez ji aliyê Zanîngeha Aksarayê, Enstîtuya Zanistên Civakî, xwendekarê masterê yê beşa dîrokê Mustafa Dogan ve di bin çavdêriya/şêwirmendiya Prof. Dr. Taner Aslan de hatiye amadekirin.

Mijara tezê: *Eşîrên cihanbeyliyan li gorî Deftera Nifûsê ya Osmanîyan ya hejmare 3525*, ev teza ji ji aliyê sê endamên serekê yên orijînal/taybetî ve hatiye îmze îmzekirin, wek pirtûk di 2019'an de, tev 245 rûpel in, bi piranî belgeyên orijînal û tabloyên qeydên nifûsê. Guhertoya pirtûkê ya vê tezê niha li ser înternetê wekî pdf heye.

Di vê tezê de tenê Tomara Nifûsê ya Osmanî ya bi jimareya 3525 ya sala 1851ê hatiye lêkolînkirin. Di tezê de behsa Eşîra Cihanbeylî û Eşîrên Têkiliya Wê hat kirin. Tiştê ku di cih de balê dikişîne ew e ku Cihanbeylî wê demê ne navendek bû, navend navçeya 'Çeltik' a Konyayê bû û

eşîra ku li wir bi cih bûbûn an jî li wir bi cih bûbûna Eşîra Hesbkeşan bû. Naşibe navekî tirkî, navekî farisî/kurdî ye Hesbkeşan (*At Çeken*). Niha li Cihanbeylî taxa Atçeken heye. Tê zanîn ku ev eşîrên koçer ji sala 1740an vir ve li deştên Çêltik, Yunak û Cihanbeylî yên platoya (deşt) Konyayê bi cih bûne. Tu şik tune ye: kurd an tirk mijareke lêkolînê ye. Nayê zanîn ku paşê ev eşîr li ku belav bûye, belav bûne yan hatine asîmîlekirin, lê ger salname û pirtûkên nifûsê yên wê demê werin lêkolînkirin, dê hejmara nifûsa wan bi eşîret û navên wan diyar bibe. Tê zanîn ku eşîrên koçer ji dema Selçûqîyan 1184'an vir ve hatine û li van deştan bi cih bûne, lê divê bê lêkolînkirin ku ew ji kîjan eşîrê bûne. Navê berê yê Cihanbeylî Înevî ye. Ev nav bi komarê re bûye Cihanbeylî. Loma jî diviyabû Konfederasyon Eşîrên Cihanbeylî ya wê serdemê weke mijara behîsê nebûna eşîra Cihanbeyliyan. Eşîrên ku bi Eşîrê Cihanbeylî re ketibûn bin

vê niştעיhbûnê: Seyhanlu/Şihanli, Mikailu, Şeyhbizunlu, Modanlu, Atmanlu, Hemanlu û paşê jî eşîrên Zivelu û Geygel jî di nav vê konfederasyona heft aşîretî de bi cih bûne. Orjînala Deftera Nifûsê ya bi hejmara 3525an bi Tirkîya Osmanî ye û bi Tirkî nû jî li kêleka wê hatiye dayîn.

Ew pirtûkê bi pêşgotina tirkî dest pê dike, pêşgotina wê ku bi îngilîzî jî heye. Pêşî Mustafa Doğan di pêşgotina xwe de li ser koçeriyê û koçerên di serdema Osmaniyan de çî bûn, wiha tîne ziman:

Civakên koçer yê her car wargehê xwe vediguheztin yek ji hêmanên bingehîn yê ku civakê di Împaratoriya Osmanî de pêk tînin. Van hêmanan bi nifûsa xwe ya girîng a mirov û heywanan her dem di nav dewletê de di rewşek berbiçav de ne. Her çiqas karê sereke yê koçeran xwedîkirina ajalan bû jî, bi saya deveyên ku xwedî dikirin û her wiha xebatên çandiniyê yê bisînor di sektora veguhestinê de jî rol listin. Împaratoriya Osmanî her yek ji civakên koçeran jûrgehek bi hin qadên mêrg û zivistanê da; Wî sînorên vê xakê diyar kirin û di defterên serjîmariyê de tomar kir. Ji ber vê yekê koçeran tevgerên xwe yê demsalî li

mêrg û qadên zivistanê yê ji wan re hatine veqetandin pêk anîn. Yek ji van civakan mijara me Eşîra Cihanbeylî ye. Eşîra Cihanbeylî yek ji koçerên ku hatine û li Anatoliya Navîn bi cih bûne ye. Qadên jiyanê ji beşên bakur yê xeta Bolvadîn-Yunak-Cihanbeyliyê li bakurê Konyayê li ser kenara başûrbakur, heta Polatliyê ya Enqerê û li aliyê rojava-rojhilat, ji Afyon-Emîrdagê heta Gola Tûzê dest pê dikirin- ji bilî vê ya navçeya Kulu. Li vê herêmê êl bi heşt êl an jî civakên girêdayî wê re jiyanê mêrga zivistanê jiya. Eşîret hatine vê herêmê û di nîveka salên 1600î de bi cih bûne. Bi taybetî Eşîra Cihanbeyliyan û girêdanên wê, mîna gelek koçerên ku di xeta Qeyserî-Meletiyê de ji gundên ku ji ber aloziyên ku ji aliyê “Tevgera Celaliyan” ve li Anatolyayê afirandiye hatine valakirin, di vê pêvajoyê de koçî Anatoliya Navîn kirine; Ji Cihanbeyliya îro heta Polatliyê rê li ber bicihbûna wan vekir. Lê belê mirov dikare bibêje ku lêkolînên li ser hin rêxistinên koçer ên ku di serdema Osmaniyan de li Anatolyayê dijiyan, mixabin hem ji aliyê kalîte û hem jî ji aliyê hejmarî ve ne di asta ku tê xwestin de ye. Yek ji van jî eşîra Cihanbeylî ye. Di vê lêkolînê

de, piştî nîqaşkirina pêvajoya dîrokî ya civakên koçer yên ku bi Selçûqîyan re an jî piştî Selçûqîyan ji ber sedemên cuda hatine û li Anatoliyê bi cih bûne, di çarçoveya xebatên ku Anatoliyayê di bin serokatiya Selçûqîyan de dest pê kiriye, hatiye kirine. Heta dawiya Rojavayê Anadoluyê, sedemên bicîkirina civakên koçeran ji aliyê dewletê ve tînin nîqaşkirin. Paşê, piştî ku bi kurtasî lêkolînên zanistî yên derbarê Eşîra Cihanbeyliyan de hatine kirin û xwedî nirxa çavkaniyê ne, sînoren fîzîkî yên erdnîgariya ku Eşîra Cihanbeyliyan/Konfederaliyên Eşîrên lê dijîn û taybetmendiyan îdarî, civakî û aborî yên eşîrên hatine vegotin û potansiyela civakî û aborî ya van eşîrên hewl tê dayîn ku were eşkerêkirin.

Mustafa Doğanê ku teza xwe li ser vê Defterê Nufuse nivîsandîye, di Deftera Hejmara 3525an de parvekirina eşîran li gundan û hejmara malan di tabloyan de, serokên malan û pişeyên wan û meşgalê wan dide. Bi rastî, ji xeynî serê malbatê hin komên pişeyî jî didin; Weke mînak: xwediyê pez, bazîrganê/tucarê pêz, deveçêker, devefiroş/hêştîrfiroşker, şivanê pêz-şivanê berxan, xwediyê bizin, rencber,

çerçî, xwediyê gayekî, xwediyê du gayî, terzî, îmam û xizmetkar jî tê gotin. Heta behsa eşîrên ku erdekî hindik çandine jî dike. Karên sereke yên eşîrên Cihanbeyliyê xwedîkirina pêz û xwedîkirina hêştiran/deveyan e. Piraniya van eşîran jî eşîrên Kurdan in ku beriya salên 1850î li herêmê bûn. Eşîr hene ku di vê Pirtûka Nifûsê de nehatine qeydkirin, lê hinek girêdayî Aksaray, Kadinhan- Sultanhan û hinek jî bi Akşehir û Sarayönüyê ve girêdayî ne. Em nikarin di vê deftera hêjmarê 3525 de agahiyê li ser wan bibînin. Weke mînakeke navên Xalîkan, Cutkan, Bilikan, Canbegî, Omeran di vê lêkolînê de cih nagirin, ev eşîr herî kêr dused sal in li vê herêmê ne. Hemûyan hîn jî bi navên xwe yên berê tîne nas kirin. Piştî qeydkirina deftera Nifûsê, hatine herême. Îhtîmaleke din jî ev e ku eşîrên ku min dihesibînin ne girîng bûne ji ber ku koçer bûne û hîna jîyanek gundî ya rûniştî qebûl nekiribûn.

Derbarê gundê Katranciye de, çavdêriyên George Perrot (1) ên li ser rewşa civakî û aborî ya rîşîra Mikailû hûnguliyên zêdetir tîne ber çavan. Di vê çarçoveyê de Perrot di 29'ê îlona 1861an de diçe gundê Katranciya yê

Haymanayê. Yanî 10 sal piştî dîroka ku pirtûka 3525 hatiye tomarkirine. Ew dibêje ku ev gundê herî mezin yê Kurdan e ku wî heta niha dîtiye. Ew diyar dike ku hinek malbat vegeriya-ne malên xwe, hinek jî hîn di konên xwe yên reş ên mezin de ne. “Di vê mêrgê de bi qasî sed deve/hêştir radiwestin û karwan bêhna xwe vedike. Li ser dûxanên xaniyên bi dûxanên rastê qumaşên ku dawîya wan daleqandî ne. Konên reş hê jî li ser çokên/stûnê xwe radiwestin. Jinên xwarinê amade dikin di navbera konan (çadır) de diçin û tên. Zarok bi gerdeniyên zîv li stûyê xwe li erdê dizivirin, keran jî nalîn û li dayikên xwe digerin”. G. Perrot di berhema xwe de behsa ‘cil û bergên’ jin û mêrên kurd dike û dibêje ku jin ji xizmên xwe yên kurd ên ku lê tên cudatir cil û bergên xwe li xwe dikin û vê yekê bi hewayê ku lê dijîn ve girê dide. Her wiha behsa wê yekê jî dike ku bi taybetî mêr ji mêrên tirk pir cuda ‘cil û bergên’ xwe li xwe nakin. Ew tenê dibêje ku fezên wan glover in, ne wek yên tirkan goşedar in. Dibêje ku ew yekem ewropî ye ku xelkê vê derê dîtiye, loma jî mirov bi çavên matmayî lê dinêrin. Ew seredana mala serokê xwe yê ku navê

Bey lê dide, dike û bi hûrgilî avaniya hundurê mala xwedê vedibêje, ji şêwaza danîna sifrê û servekirina xwarinê bigire heta awayê rûniştina li ser sifrê. qehweya piştî xwarinê û titûn kişandin. Yek ji tiştên ku herî zêde rêwîyan matmayî hişt ew zibila ku mirovan di rojên sar ên zivistanê de wek sotemenî amade dikirin. Rêwî bi berfirehî amadekirina gomê vedibêje. Pir heyirî mabû ku xwarin bi vê zibilê hatiye amadekirin û carek jî titûna wî jî bi pariyek çopê hatiye şewitandin.

Perrot di berdeyamî de: “Ew ku hem kon û hem jî xaniyan bi kar tînin, nîşan dide ku ew ne koçer in û ne jî bi cih bûne. Hin dever paqij kirine û çal kirine, lê hîn jî çandinî ji bo wan karê duyemîn e. Genim û ceh tenê ji bo xwarina xwe diçînin. Ji vê yekê debara xwe nakin. Ew ji xemilandina xwe hez dikin û ‘cil û bergên’ xwe yên giranbûha, çekên pola yên Şamê yên bi teşe genim, an marikên bezayî yên bedew ên serekên wan bi dahatên xwe yên çandiniyê nakirin. Ya ku wan ewqas dewlemend dike hesp û pezên ajalên ku ew diçerînin û difiroşin Stenbolê, Îzmîrê û Trabzonê ne. Rêwîtiya ji vir heta Stenbolê 40 rojî digire. Gundê Katranciye yek ji

gundên herî dewlemend ên Haymanayê ye. 60 deve/hêştirê wan hene, bi kirê didin karwanan. Deveyeke ku bi tevahî mezin bûye 8000 para, bi qasî 1600 Frankî ye. Li gorî nirxa heywanên din ev jimareke pir mezin e. Nirxa gayekî mezin yê ku dikare zeviye biçînîne 1000 para ye. Ew tenê 6000 e, heke hîna têra xwe neçandiye. Xwedîderketina hêştiran li vir mîna xwedîkirina keştiyeke barhilgir a li rojava ye. Bi van hêştiran sewqiyata her derên Anadoluyê tê kirin. Lê belê, yek ji van hêştiran li Anatolyayê gewre nebûye; Ev hemû ji Sûriyê tên. Li gorî kurdan li vê cihê ku deve lê dijîn deve nikarin xwe zêde bikin. Lê dîsa jî meriv dikare deveyên dema îdara tirkan li Yunanê bibîne. Ew dikare li Toxana Jêrîn, li derdora Pisa jî bê dîtin. Îhtîmal e ku kurd ji welatê xwe Sûriyê, di şert û mercên herî guncaw de lê ji dayik bûye û mezin bûye, bikirin sûdmendtir, dibînin”.

F.M. Charles Texier (2) dema qala Haymanayê dike, tîne ziman ku şênîyên vê derê ji kevin de bi şewitandina kermê bo germ bûne. Ji ber ku taybetmendiya sereke ya herêmê ew e ku hema hema bi tevahî bê dar e. Bi gotineke hêsan, ev kêşeya

kermê îro jî heye, her çend bi rêjeyek piçûk Kurên Anatoliya Navîn sobeyan ji bo germkirinê û ji bo xwarinê bikar tînin. Dûz, piştî komirê ji bo germkirinê, berê mazota herî hêsan û erzan bû.

George Perrot, ku xwedî nêrînen pir nijadperest e û serweriya nijada Aryen diparêze, dibêje ku kurd bi zorê sirgûnî vê erdnîgariyê bûne û ev nijada bilind, endamek ji hindok-Malbata Ewropî, divê ji Tirkan rizgar bibe.

“Her çiqas Kurd li van herêmên Navîn ên Asyaya Biçûk pir hindik bin jî, her kesê ku li nêzî wan dijîn ji wan ditirse û newêre xwe nêzî wan bike. Rêvebirên Tirk girîngiyeke mezin didin Kurdan. Birêz û efsêrên rayedar bi hemû kar û barên fermî ve mijûl dibin. Hewl didin daxwazên gel zêde red nekin”. Perrot nikare bi awayekî eşkere dijminatî û nijadperestiya xwe ya dij-tirk nîşan bide, dema ku karê xwe bi paragrafa jêrîn temam dike: “Berî ku ji Haymana derkeve, em vê yekê bînin bîra we; Ev niştecihên ku lûtkeya şaristaniyên Med û Suryaniyan û şaristaniyên li ser zinaran hatine xêzkirin, di vê erdnîgariyê de weke dirêjkirina Rojava cihê xwe girtine.

Sedsal berê, van şaristaniyan destên dagirkerên Tatar guhertine. Kurdên ku koçî vir kirine, berpirsyar in ku mîrateya bav û kalên xwe yên ku rabirdûyeke bi heybet/asalet hiştine paşve bistînin. Ger pêşbîniyên me me nehêlin, ev nifûsa bi eslê xwe Îranî, ku piştî serketinên Qralê Mîdya Kyaxares û Kîrusê Farisî navenda Asyaya Biçûk dagîr kir, wê bi Yewnan û Ermeniyên re li ser vê herêmê serwer be û wê tirkên tune bike. Gav bi gav, hêdî hêdî, an jî bi kêmanî ew ê kêr bikin û bi xwe ve girêdayî bikin. Berhemek din a girîng a “Perrot Souvenirs d’un Voyage en Asie Mineure” (*Bîranînên Rêwîtiyeke Asya Biçûk*) ye. Di vê berhemê de derbarê Kurdên Anatoliya Navîn de agahiyên girîng hene: “Kurdên vê herêmê ku di konên xwe yên reş de dimînin, zeviyan naçînin. Kesek ji wan nikare cot bike. Ew tenê şivan in û tenê tiştê ku difiroşin heywan in. Ew nizanin mal çi ye. Dema meriv ji nêz ve li wan binêre, hûn ê bibînin ku ew ji nijada Aryan in. Ew tenê hinekî kêmtir bedew û kêr bi rêkûpêk in. Pir dişibin îraniyan. Bavên wî yên mîna tîrê, çavên wî yên tarî, pozê wî yê rast, lêvên xweş, û rihekî wî yê reş û gewr li ser çena wî

heye. Bi tirkî dipeyivin lê devokeke wan giran e. Bi dîtina min ev tenê Kurd in. Ermeniyek ji Adapazariyê hat ku ji wan dewar bikire bibe (...) Gavanên kurd li herêmê ji Enqereyê heta Konyayê keriyên mezin ên heyvanan/gayê mezin diçêrînin, dibin”.

Rexnekirina vê tezê encax bi dîtina orijînalê Qeyda Nifûsê a jimara 3525an û xwendina wê, bi rengekî ji hêla Mustafa Doğan ve hatiye kirin, dibe bibe alîkar. Ne diyar e ku gundên ku di deftera siftê de hatine tomarkirin navên resen in an tirkîya nûjen in. Ji ber ku di wê serdemê de bi giştî mezinên malbatê yên bê paşnav û paşnavên wan dihatin bikaranîn. Mesela kurê Îdo Hesên, kurê Hesoyê Derwêş, Uzun Kulak Hesên, kurê Satî Memed, Diyarbekiroglu Yûsif, Abuzaroglu Memed, Kurdoglu Bekir, kurê Mirazê Bekir, kurê Mistefa Besê Şato. Divê ev hemû bîrên lêkolînkirin, lê divê tenê kesên ku Osmanî baş dizanin û tîkiliyên eşîr û tirkên baş dizanin.

Dema ku ev deftera kaydê dihat tomarkirin, di sala 1845an de li herêmê, yanî li deştêyên ku ev eşîr lê dijîn, xelayeke/xizani mezin derket. Ev ji eşîrên Cihanbeylî-Yunakê ji ber xelayê û xizaniyê koçî Afyon Bolva-


dînê û Emîrdagê û heta Kutahyayê û Bursa kirine. Hinek eşîrên li aliyê Enqereyê Haymana Polatliyê çûne Sêwasê, Diyarbekir, Meletî û heta aliyê Tokat Çorûmê belabûne. Piraniya Şehbizinî û Mîkailiya çûne zêdeyî herêmekê.

Zêdekirina dawî ya vê gotarê ev e ku konfederasyona Eşîrên Cihanbeyliyê bi demê re û bi guhertinên ku di avahiya îdarî ya bi Komarê Tirkîyê re

hatin kirin, bi tevahî ji nû ve hatiye organîzekirin. Di deftera nifûsê ya kevin de dabeşkirina eşîrî bi navçeyên nû û gundên yekîneya îdarî ya nû ve hatiye guhertin. Yên berê yên ku bi Cihanbeyliye re bûn, niha bi Enqere Haymana, Polatli, Bala, Koçisar, Kulu ne; Hin ji wan bi Konyayê Yunak, Çeltik, Sarayönü ve girêdayî ne. Hin ji wan bi xwezayî jî asîmîle bûne, weke: xorxor, rêvan, soryan.

- (1) *Georges Perrot (12'ê sermawezê 1832-30'ê pûşperê 1914) arkeologekî fransî bû. Ew ji 1875an de li Sorbonne mamostetî kir û ji 1888an heya 1902an rêveberê École Normale Supérieure bû. Di 1874an de ew ji bo Academie des Inscriptions et Belles-Lettres hate hilbijartin, li wir ji 1904an heya mirina xwe sekreterê daîmî xebitî. Piştî ku di sala 1857an de parçeyek yekem a koda Gortyn vedît, keşfa wî ya herî navdar a arkeolojîk di sala 1861an de dema ku di seferekê Asyaya Biçûk de bû, li wir wergerek Yewnani ya belgeya ku bi navê "Peymana Siyasî ya Qeyser Augustus" tê zanîn, dît. Perrot editori kir û beşdarî kovara Revue archéologique kir. Berhemên wî du vegotinên sefera wî ya Asyaya Biçûk (1862 û 1864 hatin weşandin) û deh cild "Histoire de l'art dans l'antiquité", ku wî bi Charles Chipiez (1882-1914) re nivîsand. Georges Perrot, Bîranînên Rêwîtiyek Asya Biçûk (Souvenirs d'un Voyage en Asie Mineure), The Paper, Paris 1864,*
- (2) *Felix Maria Charles Texier (22'ê gelawêjê 1802, Versailles- 1'ê tîrmehê 1871, Paris) dirokzan, mîmar û arkeologê fransî bû. Texier gelek xebatên girîng ên ku bi rêwîtiyên kesane yên li seranserê Asya Biçûk û Rojhilata Navîn ve girêdayî ne weşandin. Di van pirtûkan de danasîn û nexşeyên şûnwarên kevnar, raporên erdnîgarî û erdnîgarîya herêmê, danasînên karên hunerî û mîmarî û hwd. Li École des Beaux-Arts li Parîsê wek mîmarî hat perwerdekirin, ew di 1827an de wek mufetîşê karên giştî hat tayîn kirin. Di 1833an de ew ji bo mîsyoneke keşfê hat şandin Asya Biçûk, li wir, di 1834an de, wî kaviilên paytexta Hîtî ya kevnar Hattusa keşf kir. Di encama seferê de, wî sê cild "Danasîna Asyaya Biçûk bi fermana Hikûmeta Fransa hatiye çêkirin" weşand. Paşê car ew di nav de beşdarî seferekê bû ku ew bir Ermenistan, Mezopotamya û Farisan cû.*

DONATIONER
— VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID —
ALÏKARÎ
— TEVLÎ PÊŞEROJA ZAROKAN BIBIN —



TÊKILÎ / KONTAKTA OSS
Mjölmarstigen 1, 163 41 Spånga,
Stockholm, Sweden
E-mail: info@stiftelsenkan.com

Hevkarên me / Våra samarbetsparner



Folkuniversitetet

Folkuniversitetet Gävleborg

Drottninggatan 10, 803 20 Gävle



ABF Botkyrka-Salem

Hallunda